Politik ART

KOVARA MEHANE YA WÊJE HUNER Û RAMANÊ

07 Hezîran 2025 Şemî

HEJMAR : 339

Mêraniya qirêj a Mêtingeriyê

Editör: Luqman Guldivê

● Rojîn ÎBÎŞ ● Karolîn EBASÎ ● Aya SALIH ● Rozalîn EBASÎ ● Zehrîban HISÊN ● Bêrîvan MECÎD ● Sorgul EBDULSELAM ● Zozan MIHEMED

Bi perspektîfa jinan pêvajoyên dekoloniyal

Mêtingerî bi dawî bibe gelo hema wilo bi dawî dibe? PolîtîkArtê di vê hejmarê de ev pirs ji xwe kir. Xwendekar û mamosteyên Jineolojiyê li Zanîngeha Rojava ya li Qamişloyê, nivîskarên vê hejmara me ne. Mamoste Bêrîvan, Sorgul û Zozan bi newekheviya cinsî û modela Rojavayê Kurdistanê dadikevin. Ew gelek rexneyên li sîstema heyî îfade dikin û berê xwe didin tecrûbeya Rojava. Xwendekar Zehrîban Hisên jî hewl dide fêm bike ka mêtingeriyê çawa xwecih û nexasim jî jinên xwecih weke yên din ava kirine. Rojîn Îbîş jî ji xwendekaran e ku bi meseleya dagirkirina vegotina dîrokê dadikeve. Xwendekar Rozalîn Ebasî jî bi wê peywendiya binyadî ya di navbera mêtingerî û baviksalariyê de daketiye û dibêje, her du destûbirayên hev in. Xwendekar Karolîn Ebasî jî berê xwe dide têkiliya baviksalarî û mêtingeriyê, lê ew bala xwe bêhtir dibe sermesleya ziman û baviksalariyê. Luqman Guldivê li deveryî mijara dosyayê bi serpêhatiya Medoka Melê û Mihemedê Hena dadikeve ku yek ji serhatiyên balkêş ên li ser evîna di navbera du diyanetên cuda de ye. Ev hejmara me bi dosyaya xwe wê we bibe nava eqarên minaqeşekirina mêtingeriyê ji awirekî jineolojîk ve. Têbîniyên mamoste û xwendekaran ên li ser Linda T. Smith jî di destpêkê de wê çarçoveyekê deynin da ku em zanibin, di kîjan peywendê de xwendin û şirove hatine kirin.

PolitikART

Herausgeber: *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Frankfurter Str. 181, 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Özlem Cakar politikart@yeniozgurpolitika.org

Çima metodolojî were dekolonîzekirin

Împeriyalîstan digot, mêtingehkirî nikarin tiştan vebînin/dahênin/keşf bikin, ew nikarin saziyan û dîrokê ava bikin, ew nikarin texeyul bikin, ew nikarin tiştekî bi qedr û qîmet hilberînin, ew nizanin hunerên şaristaniyê tetbîq bikin. Ev xisletên hanê, kesên mêtingehkirî yan jî xwecih û bi giştî rojhilatiyan ne tenê weke "nemedenî" lê her wiha weke "neinsan" jî ava dike.

Edîtor*

Lêkolera Maorî ya ji Zelandaya Nû, Linda Tuhiwai Smith dibêje, tecrûbeya zindî ya împeriyalîzm û mêtingeriyê rê li ber wê yekê vedike ku mirov bi awa û rêyên din jî di peyv û konseptên weke împeriyalîzmê bigihîje. Bi ya wê, miletên xwecihî li vî aliyê hanê yê mesleyê serwext bûne. Ew împeriyalîzmê û têgehên dîrok, nivîsîn û teoriyê bi hev ve elaqedar dibîne. Di vê peywendê de Smith hewldana bi rêya poskoloniyalîzmê jinûveavakirina rola întellektuelên rojavayî di pênasekirina dinyayê de red dike. Ew dibêje, lazim e ku protokol, nirx û şêl û tevgerên xwecihan di nava lêkolînê de weke faktor werin avakirin, û encamên analîz û minaqeşeyên lêkolînê li gelên xwecihî werin vegerandin. Ji ber vê, ew pênasekirineke bi awirên xwecihan a van têgehan pêşniyaz dike.

Întelektuelên xwecihî divê amûran bisêwirînin û zanîna xwecihê vejînin ji bo bi dawîkirina mêtingeriyê. Smith her wiha pêşniyaz dike ku împeriyalîzm weke meydaneke dîskursîv (xwe disipêre minaqe e û muzakereyên bi minaqe eyan) a zanînê were dîtin. Yanî ew dixwaze koma întelektuelên xwecihî ji xwe bipirse: miletên mêtingehan çawa birin nava sîstema împeriyal? Vê têgehkirina împeriyalîzmê weke meydaneke dîskursîf, pêdiviyeke dekolonîzekirina mejiyan da hîskirin. Smith ji vê re dibêje jinûvebidestxistina mirovahiya xwe. Lewma têgehkirinên din ên împeriyalîzmê - weke ewên hatine vedîtin - yên li navendên împeriyal ava bûn, mêtingehkirî weke 'nemirov' yan jî 'mirovên kêm' bi texeyuleke împeriyal ava kirin. Ji ber wê Smith dixwaze ku bi têgehkirina nû, mêtingehkirî li ser mêtingehkirina xwe bibin xwedî analîza xwe. Di vê hewldanê de hîmên sereke, civakên tekûz ên beriya împeriyalîzmê (civakên ku bi temamî endamên wan ew çêkirine) û civakên beriya wan in. Yanî dîrok û bi zanîna dîrokê dibin çavkaniyên avakirina têgehê û rewakirina wê.

Xwecihan dikin nemedenî û neinsan

Ev têgehkirin, gava berê xwe dide împeriyalîzmê û encamên wê, dibîne ku yek ji tiştên muhim, xisletên qaşo bûn yên ku miletên mêtingehkirî bi wan pênase dikirin. Navendên împeryal ev xislet ava dikirin û li mêtingehkiriyan bar dikirin. Yek ji wan xisletan ew bû ku xwecih/mêtingehkirî nikarin/nizanin eql û mejiyê xwe bixebitînin. Yanî împeriyalîstan digot, mêtingehkirî nikarin tiştan vebînin/dahênin/keşf bikin, ew nikarin saziyan û dîrokê ava bikin, ew nikarin texeyul bikin, ew nikarin tiştekî bi qedr û qîmet hilberînin, ew nizanin hunerên şaristaniyê tetbîq bikin. Ev xisletên hanê, kesên mêtingehkirî yan jî xwecih û bi giştî rojhilatiyan ne tenê weke "nemedenî" lê her wiha weke "neinsan" jî ava dike. Ev têgehkirin, rojhilatiyan, mêtingehkiriyan, xwecihan weke ne insanên tekûz û tam bi nav dike. Smith ji bo rave bike vê hizra xwe, xwe davêje bextê gotinên Edward Said jî, yê ku dibêje, "rojhilatî (oriental)" qismî bi destê "rojava" bi rêya xebatên akademîk û texeyulê hatibûn afirandin; bi gotinên Fanon jî kolonîzekirî û kolon (yên kolonîze dikin) hîna nû bi hev re çêdibin, heyî dibin; û hem kolonîzekirî û hem jî kolon bi hev du û bi destê kolonyalîzmê dihatin afirandin (2021: 28-29).

Di hizra Smith de ev têgehkirina weke insanên netekûz, kêm yan jî weke neinsan a mêtingehkiriyan, xwecihan, dûriyekê dixe navbera wan û kolon û kolonyalîstan. Ev yek jî destûrê dide navendên împeryal da ku ew karibin siyasetên qirkirin û kedîkirinê bi rê ve bibin. Ji ber vê jî, li gorî wê têkoşîna ku pê doza insanbûnê tê kirin, di nava gotarên antîkoloniyal ên li ser mêtingeriyê û tepisandinê de xeteke daimî pêk tînin. Ev têkoşîna ji bo mirovahiyê jî di nava têkoşîneke berfirehtir a mirovbûnê, banga ji bo mafê mirovan, hizra kirdeyê gerdûnî "mirov" de cihê xwe digire, û ne xasim jî di peywenda mirovbûn û şiyana afirandina dîrok, zanîn û civakê de.

Di meseleya neinsankirinê de hizrên Smith li ser koledariyê muhim in, koledarî di vir de weke sîstemeke împeriyalîzmê xwe dide der, ew ji dagirkirina erdên miletên din û wê de diçe. Ew mirovan dike kole û wan ji welatê wan dibe welatên din da ku li wan deveran weke kole (hêza kar a di statuya milk û mal -meta- de) bên bikaranîn.

Doza insanbûnê kirin û doza dîroka xwe kirin

Ji bo arîşeyê û berxwedanê rave bike, Smith berê xwe dide têgehkirinên Fanon jî. Bi şerên serxwebûnê yên piştî Şerê Cihanê yê Duyemîn re nivîskarên weke Fanon, vê pêvajoyê weke pêvajoyeke şidetê "ya ku tê de du hêz ji ber xwezaya xwe bixwe dijberê hev in" (**) pênase dike û dibêjin, "Dekolonîzekirina ku dest pê kiriye nîzama dinyayê biguhere, eşkere ye ku ber-

Smith banga Fanon bi bîr dixe; Fanon ji rewşenbîrên welatên ji mêtingeriyê xilas bûne, dixwaze edebiyatekê bi pêş bixin ji bo avakirina çandeke neteweyî piştî serxwebûnê. Nirxandinên Abdullah Ocalan ên elaqedarî rewşenbîr û nivîskarên Kurdan û banga wî li wan ji bo ku wêjeyeke têkoşîna rizgariyê ya xweser, vegotina wê têkoşînê ava bikin, ji ya Fanon û wê de diçe, lewma Ocalan li benda bidawîkirina mêtingeriyê nasekine.

nameyeke bênîzamiya tam e." (***)

Weke kêm nîşandana xwecihan, behsa nebûna nîzama wan jî dihat kirin. Heger xwecih, mêtingehkirî nenîzam in, û ev nenîzam hebe, naxwe divê weke xisleta împeriyalîzmê nîzam jî hebe. Smith ji bo ravekirinê berê xwe dide hin kesên weke Albert Memmi yên ku serê xwe bi vê êşandin, ji vê re gotin "şîfre" yan jî "rêzimana" împeriyalîzmê (****). Ev hizra şîfreyê balê dibe ser hebûna avahiyeke binyadî ya kûr a ku pratîkên împeriyal li aliyekî birêkûpêk dike, li aliyê din jî rewa dike. Em bi vê yekê dikarin bibêjin, bi rêzek mizakereyan (Memmi wisa bi nav dike) hat mandelkirin ku miletên xwecih û mêtingehkirî xwedî sîstemên xwe yên nîzamê bûn. Em berê xwe bidin van mizakereyan:

Xwecihî bi temamî ne mirov bûn, ew ji bo bibin xwedî sîstemên xwe têra xwe ne medenî bûn, ew nexwende bûn, ziman û awayên hizra wan ne guncaw bûn (*****). Lê ya bi rastîqewimî çi bû? Împeriyalîzmê bênîzamiyeke tekûz xiste nava civakên mêtingehkirî, ew ji dîroka wan, ji mekanên jiyana wan, ji zimanên wan, ji peywendiyên wan ên civakî, ji rêyên wan ên hizirîn, hiskirin û danûstandina bi dinyayê re qut kirin (Binihêre li ** û ***). Bi van argumanên Smith em tê digihêjin, ji bo mêtingehkiriyan û xwecihan parçebûn encama împeriyalîzmê bû.

Em ji vir êdî ber bi eqarên têgehkirinên nû yên nivîs, dîrok û teoriyê ve diçin. Çimkî di peywendeke wilo ya împeriyalîzm û mêtingeriyê de her hewldana mêtingehkiriyan yan jî xwecihan berê awirê xwe li venivîsîn û ji nû ve rewakirina cihê wan di dîrokê de ye: Xwecihî dixwazin serpêhatiya xwe vebêjin, versiyonên xwe binivîsin, bi rêyên xwe û bi sedemên xwe. Mesele ne vegotineke devkî û navlêkirineke şecereyî ya welat û bûyerên ew wêran kirî ye; mesele ew pêdiviya xurt a şahidiya ruhekî û vejandina wî ruhî ye, heyîkirina wê dinyaya parçeparçe kirî ya dimire (Smith 2021: 30-31).

Smith dibêje, hisa dîroka ku bi vê helwêstê tê ragihandin û disîplîna dîrokê ne heman tişt in, ji ber wê jî dîrok û serpêhatiyên mêtingehkiriyan û yên disîplîna dîrokî li bin guhê hev dikevin. Nivîs gelek caran weke navgîneke ji bo guhertinê tê dîtin. Demeke dirêj nivîskîbûn weke çanda ji yên din bilindtir hat dîtin (Elaqeya bi dewlet û desthilatê re). Heta hat îdîakirin ku xwendebûn hilberîneriya çandî bi pêş dixe. Nivîskîbûn çi bi qest û çi jî hema wilo çawalêhato, bi şaristaniyê re weke hevmane jî hat nîşandan (Binihêre li *****).

Smith dibêje, di peywendeke bi vî rengî de nivîs weke nîşana şaristaniyên çêtir hat dîtin û mêtingeran/navendên împeriyal û akademiyên wan li gorî vê nihêrînê hukm da ku civakên din (mêtingehkirî) ne xwediyê hizra rexneyî û objektîf (tişteyî) in yan jî ew nikarin xwe dûr bikin ji fikr û hisan. Ew bi îhtîmam dibêje, nivîsîn parçeyek ji teorîkirinê û parçeyek ji dîrokê ye û pê digihêje vê encamê: Nivîsîn, dîrok û teorî warên kilît in ku li ser wan lêkolîna rojavayî û dinyaya xwecihan (mêtingehkiriyan) pêrgî hev tên. Lê em dizanin, nivîsîn û nexasim nivîsandina teoriyê ji bo lêkoler û xwendekarên xwecih karekî tirsnak e (Smith 2021: 32).

Smith banga Fanon bi bîr dixe; Fanon ji rewşenbîrên welatên ji mêtingeriyê xilas bûne, dixwaze edebiyatekê bi pêş bixin ji bo avakirina çandeke neteweyî piştî serxwebûnê yan jî rizgariya ji mêtigeriyê. Li vir bila her wiha li bîra we be ku nirxandinên Abdullah Ocalan ên elaqedarî rewşenbîr û nivîskarên Kurdan û banga wî li wan ji bo ku wêjekyeke têkoşîna rizgariyê ya xweser ava bikin, vegotina wê têkoşînê ava bikin, ji ya Fanon û wê de diçe, lewma Ocalan li benda bidawîkirina mêtingeriyê nasekine (Ocalan 1997: 27-64).

Smith berê xwe dide rexneyên li sêwirandina dîrokê û pêşî behsa rexneyên poststrukturalîst (piştî binyadhgeriyê) dike. Poststrukturalîst xislet û têgihiştinên dîrokê weke projeyeke modernîst yan jî projeyeke Serdema Ronakbîriyê rexne dikin. Rexneya wan hem li konseptên lîberal û hem jî li konseptên marksîst ên dîrokê ne. Femînîstan jî ev pênasekirina dîrokê rexne kir, lê ne illeh ji perspektîfa poststrukturalîst, wan got, dîrok serpêhatiya awayekî taybet ê serweriyê ye, ew awayê taybet jî baviksalarî ye. Gava mirov berê xwe dide peyva bi Ingilîzî history, mirov dikare wê weke his-story (serpêhatiya wî) jî ji hev derxe (2021: 32).

Zalkirina nivîsê li ser peyva devkî

Devkîbûn, beramberî vê têgehkirina nivîsê û dîrokê, bi awayê berxwedanê dimîne. Smith li ser meselê bi bîr dixe ku gelek vegotinên devkî hene, ew behs dikin ka maneya wê yekê çi ye, ka hiseke çawa bi mirov re çêdibe, gava li ber çavên mirovî dîroka mirov jê tê birin, weke ne muhim, ne guncaw tê redkirin û nayê dîtin, yan jî weke kelevajiyên şêt û dînên kal tên bêqîmetkirin. Li gorî Smith, redkirina nihêrînên mêtingehkiriyan di biwara dîrokê de yek ji parçeyên heyatî bû ji bo îdîaya îdeolojiya mêtinger: Nihêrînên xwecihan weke besît (primitive), nerast dihatin dîtin, ji ber ku wan li dijî mêtingehkirinê li ber xwe dida (2021: 33).

Xwecihan yan jî mêtingehkiriyan dîrok weke ji bo serwextbûna li îro muhim nirxand (bigire li ber sernavê vê kitêba Ocalan ******) û xwedîderketina li dîrokê jî weke aliyekî muhim ê dekolonîzebûnê û dekolonîzekirinê nirxand. Rexneya li dîroka rojavayî ya sereke ew e ku ew projeyeke modernîst e. Ew proje li dora wan baweriyên împeriyal ên di biwara "Yên Din" de hatiye çêkirin û bipêşxistin. Dîroka sîstema împeriyal jî li dora gelek fikrên di zik hev de (interconnected) hatiye avakirin. Smith hewl dide van fikrên sereke wiha bike rêz:

1) Fikra, dîrok dîskurseke yekker yan jî yekrengker (totalizing): Sîstemên tesnîfkirinê, qaîdeyên ji bo pratîkê û rêbaz, lazim in da ku zanîn were neqandin û li dîrokê were zêde kirin.

2) Fikra, dîrokeke gerdûnî heye: Xislet û nirxên bingehîn ên hevpar ên tevahiya civak û kirdeyên insan hene. Bipêşxistina van xisletên gerdûnî ji bo dîrokê giring e.

3) Fikra, dîrok kronolojiyeke (tenê ya) dirêj e: Dîrok weke geşedana di nava demê de tê dîtin. Kronolojî weke rêbaz giring e ji ber ku destûrê dide bûyer di demê de li ser xaleke diyar bên bicihkirin.

4) Fikra, dîrok elaqedarî geşedanê ye: Di fikra geşedanê ya di vir de bipêşketin û bipêşveçûn hene. Civak her bi pêş ve diçin. Destpêk besît, primîtîf û hestiyar bû. Gava civak bi pêş dikevin, kêmtir primîtîf dibin.

5) Fikra, dîrok li ser kirdeyeke (subject) insan e ya ku xwe pêk tîne: Di vê fikrê de mirov dikarin xwe qonax bi qonax bi pêş bixin. Tevî ferdan, civak jî di van qonaxan re dibihurin.

6) Fikra, serhatiya dîrokê dikare bi vegotineke hevgirtî bê gotin: Em dikarin faktan hemûyan bi awayekî nîzamî berhev bikin û ew ê rastiyê ji me re bibêjin, yan jî em dikarin bibin xwedî fikrekê li ser tiştа ku muhtemel e bi rastî jî qewimîbe.

7) Fikra, dîrok weke disîplîneke zanistî bêguneh e: Li gorî vê fikrê, lêkoler tenê faktan didin hev û têkiliya wan bi hev re datînin. Fakt bi serê xwe serhatiya xwe dibêjin. Pêdivî bi şiroveyên yan jî teoriyên dîrokzanan nîne.

8) Fikra, dîrok li dora kategoriyên duhêlî hatiye avakirin: Xwe disipêre rêbaza kronolojîk a dîrokê. Xwe disipêre vedîtinê: Vedîtina nivîsê, vedîtina dewletê û wekî din.

9) Fikra, dîrok baviksalar e: Elaqedar e bi fikra kirdeya insan a ku xwe pêk tîne. Ji ber ku jin di nava wan burokrasî û hiyerarşiyan de nebûn, ewên ku guhertin û geşedanên muhim ên civakî û siyasî mumkin dikirin, ew di dîrokê de jî nînin (Smith 2021: 33-35).

Di peywenda mêtingeriyê û împeriyalîzmê de nivîskîbûn ji wan pîvanên sereke ye ji bo nirxandina bipêşketina civakekê û gihiştina wê ya qonaxeke ku mirov dikare jê re bibêje, dîrok dest pê dike. Lê belê welatên weke Hindistan, Çîn û Japonayayê, tevî ku beriya ku rojava wan vebîne çandên xwende (nivîskî) bûn jî, bi tesnîfên din kirin ku ew weke nemedenî werin pênasekirin.

Smith dibêje, hizrên li ser "Yên Din" li Ewrûpayê bi sedsalan hebûn, lê belê bi serdema ronakbîriyê re, ev hizr bi rêya zanist, felsefe û împeriyalîzmê fermîtir bûn, veguherîn sîstemên eşkere yên tesnîfê û "rejîmên heqîqetê". Rejîma heqîqetê, li vir bi maneya ku fîlozofê fransî Michel Foucault bi kar aniye, tê bikaranîn. Li gorî Foucault, her civak xwediyê rejîma xwe ya heqîqetê ye. Bi heman awayî ew girêdayî sîstema desthilatê ye ya ku wê bixwe hildiberîne û dike ku dewam bike (Foucault 2012 : 91-110).

Li gorî Smith, nijadîkirina kirdeyên insan û nîzama civakî, berawirkirina di navbera "me" (yên rojavayî) û "wan" (Yên Din) de mumkin dike (2021: 35). Ev jî dîroka ku tê de mêtingehkirî nekirde û nemirov in mumkin dike.

Referans

* Edîtorê hejmarê, ev nivîs ji têbîniyên elaqedarê mijarê yên tevahiya beşdarên dersa Dekolonîzekirina Metodolojiyan a li Beşê Jineolojiyê li Zanîngeha Rojava pêk anî.

(**) Binihêre li Fanon 1990: 27.

(***) Sermeselê binihêre li Nandy 1989.

(****) Binihêre li Memmi 1991: 83.

(*****) Ji bo rexneyeke li vê yekê binihêre li Turgut 2010.

(******) Maneya navê vê kitêbê, dîrok di roja me ya îro de veşartî ye, em di destpêka dîrokê de veşartî ne, xweşik îşaret bi vê giringiya serwextbûna li dîrokê dike. Binihêre li Ocalan 1997.

Çavkanî

Fanon, Frantz. 1990. The Wretched of the Earth. London: Penguin.

Foucault, Michel. 2012. Du gouvernement des vivants: Cour de Collège de France (1979-1980). Parîs: Seuil/Gallimard.

Memmi, Albert. 1991. The Colonizer and the Colonized. Boston: Beacon Press.

Nandy, Ashis. 1989. The Intimate Enemy: Loss and Recovery of Self Under Colonialism. Delhî: Oxford University Press.

Ocalan, Abdullah. 1997. Tarih günümüzde gizli ve biz tarihin başlangıcında gizliyiz. Cihê weşanê nehatiye nivîsîn: Weşanên Serxwebûn.

Smith, Linda, T. 2021 (çapa yekem 1999). Decolonizing Methologies: Research and Indigenous Peoples. London: ZED Books.

Turgut, Lokman. 2010. Mündliche Literatur der Kurden in den Regionen Botan und Hekarî. Berlîn: Logos Verlag.

Dîrok bi çi dest pê dike?

Rojîn ÎBÎŞ*

Dîrok têgehek e ku li ser gelek nîqaş tên kirin û gelek caran weke dayika zanistan hemûyan tê dîtin û pênasekirin. Heta niha gelek cure û rêbazên dîrokê bi pêş ketine, bi piranî jî dîrok ji aliyê serdestan ve hatiye nivîsandin. Ruxmî vê gelek hewildanên nivîsandina dîroka rast û giştî çêbûne nexasim Abdullah Ocalan nirxandin û nêzîkbûneke alternatîf a dîrokê nîşan dide, di nirxandin û şiroveyên Ocalan de mirov vê yekê dibîne. Li gorî vê helwêstê, dîrok çi têgeh, çi bûyer, çi hebûn û çi jî diyarde, hemûyan dinirxîne. Ji ber ku dîrok girêdayî hebûneke têgihîştî û watedarkirinê ye, em dikarin bibêjin mirov ji mîtolojî heta dîn, ji felsefeyê heta zanistan di her serdema dîrokê de li ser rastiyê bi her awayî lêkolînê dike.

Dema mirov dizane ku dîrok ji beriya nivîsandina şaristaniya desthilatdar jî heye, di mêjiyê mirov de dibe destpêkeke giring ji bo mirov xwendina dîrokê xurtir bike. Lê meseleyên dîrokê yên elaqedarî sîstemên desthilatê hene; dema ku mirov bi sedsalan di nava sîstemeke programkirî de bijî êdî ew pîvan û rêgez dikevin binhişa wî mirovî. Dibe ku carinan di warê nêzîkatî û pratîkî de tiştên cuda derkevin holê bêyî ku mirov lê fikirîbe jî. Wateya vê ew e ku mejî di nava wan salan de bi awayekî ne rasterast jî be hatiye perwerdekirin û li gorî perwerdeya desthilata heyî heta roja me ya îro hatiye qanehkirin. Eşkere dibe ku di rewşeke wisa de însan desthilatê weke tiştekî zikmakî yan jî xwezayî dibîne, qebûl dike. Eynî weke ku mirov bi tiştekî re rû bi rû mabe û wî tiştî bandoreke mezin li mirov kiribe, û êdî ew tişt bûbe parçeyek ji wî mirovî, teştekî wilo ku ne pêkan e mirov xwe jê qut bike.

Tinekirina dîrokê bi destpêkirina bi Sumeran

Lewma sîstemên desthilatê, nexasim yên dewletdar, her tim hewl dane zincîra dîrokê kin bikin. Wan destpêka desthilatê dikir destpêka dîrokê. Ji ber wê jî wan dixwest her kes bawer bike ku dîrokê ji Sumeran dest pê kiriye. Ev ne danasîneke bêguneh e, lewma gava dîrok bi Sumeran dest pê bike, serdemên beriya wê bêqîmet dibin, ne lazim e bên zanîn û bibin parçeyekî dîrokî. Bi rengekî ji rengan ew serdem tên tinekirin, yan jî marjînalkirin. Mînak, li dibistan û zanîngehên Sûriyê, dîrok bi wî şêwazî dihat pênasekirin wekî ku dîroka dewleta Sûriya bi xwe bi mala Esed re dest pê kiriye. Ev dikirin, bêyî ku di wan pirtûkan de qet behsa pêkhateyên din bikin. Bi giştî xwe weke sîstemên demokrat didîtin yan jî nîşan didan, lê di hundir de jî heta bi stûyê xwe di nava serdestî û desthilatdariyê de bist bûbûn.

Xeta rast a Marks û bazinên Ocalan

Karl Marks ê feylesof, dîrokê weke xeteke rast dinirxîne, weke pêvajoyeke sadeleqî ya ku ti guhertin û veguhertinên mezin ên derveyî vê xeta rast tê de neqewimîne, dibîne. Ji xalekê dest pê kiriye û ta roja me ya îro berdewam e û ji beriya wê, hebûna civakên seretayî hemûyan înkar dike. Şoreşên fikir û bipêşketinên ku çêbûne, xweşik watedar nake û li gorî xwe terîf dike. Li gorî wî li destpêka xetê besît heye û her bi pêş ve çû kêmtir besît hene û heta digihîje serdema wî ya modern, li wir jî bipêşketî heye. Civakên destpêkê besît in, primîtîf in li gorî wî, û çi qasî dem biçe ew bi pêş kevin. Em mentiqê xetî, destûrê nade me ku em karibin qirkirinê di çarçoveya dîrokê de fêm bikin. Ew destûrê nade em li felaketên hatin serê şaristaniyên li Başûrê Emerîkayê jî bigihîjin, di serdema piştî ku Spanyayiyan ew der kirin kolonî de. Li hember vê yekê Abdullah Ocalan dibîne ku dîrok bazinekî domdar e, her pêvajoyek ya din temam dike. Yanî tesîra qewmîneke civakî weke xelekekê, weke bazinekî berfireh dibe û li deverên din ên li keviyên bazinên nû peyda dibin û ew jî bi heman rengî berfireh dibin. Di heman demê de dîrok îfadeya dema niha û pêvajoya neteweyan diyar dike li gorî Ocalan.

> **Dîroka ji sedî 5'an yanî ya desthilatê, esasê vegotina dîrokê pêk tîne, dîroka ji sedî 95'an hema hema xuya nake di nava vegotina dîrokê de. Em bi vî rengî têdigihêjin ku xwedîderketina li vegotina xwe ya dîrokê jî ji erkên muhim ên berxwedanê ne li hemberî sîstema desthilatê ya dewletadar.**

Gelo maqûl e dîroka ji sedî 5'ê bibe dîroka mirovahiyê?

Bêguman ev sîstem ne di roj û şevekê de hatiye sepandin. Ev sîstemeke welê ye ku bi hezaran salan hewl hatiye dayin ku were ferzkirin. Heger em li dîroka resteqîn a desthilatdarî û demokrasiyê vegerin, gotineke Ocalan a raveker heye. Abdullah Ocalan li ser mijarê dibêje, dîroka niha tê îfadekirin, a şer, dewlet, desthilat û zengîniyê belkî ji sedî 5'ê civakê îfade bike. Yanî ya mayî dîroka wê nayê gotin, nehatiye gotin. Li cem Ocalan dubereya şaristaniya dewletdarî û şaristaniya demokratîk heye. Bi vî rengî ew dibêje ji sedî 90 ta 95'ê dîrokê elaqedar yan jî aîdê şaristaniya demokratîk e. Tişta îro qewimiye bi zanista dîrokê ew e ku ev rewş berevajî kiriye: Dîroka ji sedî 5'an a desthilatê, esasê vegotina dîrokê pêk tîne, dîroka ji sedî 95'an jî hema hema xuya nake di nava vegotina dîrokê ya heyî de. Em bi vî rengî têdigihêjin ku serdema me serdema desthilatdarî û serweriyê ye; xwedîderketina li vegotina xwe ya dîrokê jî ji erkên muhim ên berxwedanê ne li hemberî sîstema desthilatê ya dewletadar. Li vir paradîgmaya Modernîteya Demokratîk a ku Abdullah Ocalan derdixe pêşberî Modernîteya Kapîtalîst, derfeta xurtkirina berxwedanê û xwedîderketina li vegotina xwe ya dîrokê jî disêwirîne.

*Xwendekara Zanîngeha Rojava, Fakulteya Zanistên Civakî, Beşê Jineolojiyê.

Mêtingerî û zimanê baviksalariyê

● **Em gelek mêran dibînin ku heke zarok baş tevnegere, jinê sûcdar dikin, dayikê dikin berpirsiyara veguhestina ziman ji bo zarokan, û heke zimanê dayikê hînî zarokê nehatibe kirin, dîsa jin û dayik tên sûcdarkirin.**

● **Ez bawer dikim ku divê em rolan ji nû ve binirxînin û fêm bikin ku berxwedana rastîn li malê dest pê dike: bi dabeşkirineke dadperwer a berpirsiyariyan û hişmendiyeke kolektîf ku ziman û nasname ne 'karên jinan' tenê ne.**

Karolîn EBASÎ*

Kolonyalîzm şêwazek serdestiyê ye ku ji hêla dewletan ve li ser welat, milet yan jî dewletên din hatiye cihbicihkirin. Kolonyalîzm hêz û şidetê bi kar tîne da ku kontrola siyasî ferz bike, erdên xelkê dagir bike û çavkaniyên wan îstismar bike. Bandora kolonyalîzmê ne tenê li warên aborî û siyasetê xuya dike, lê her weha gelên xwecih têne tepisandin, mîrateya wan a çandî û şaristanî tê wêrankirin û çanda kolonyalîst weke modela "modern" tê ferzkirina da ku karibe civakên "paşverû" ber bi "modernîte" û "şaristaniyê" ve bibe: Modeleke rewakirina pratîka kolonyalîzmê. Her çend gelek kes bawer dikin ku kolonyalîzm bi dawî bûye jî, xuyangên wê bi awayekî xurt di şiklê hegemoniya çandî, zimanî û aborî de dewam dikin, lê ew di kontrola hin welatan de li ser nasnameya welat û gelên din, heta piştî bidawîbûna dagirkeriya rasterast jî, xwe dide xuyakirin.

Ji ber ku hişê rojhilat bi pirsgirêkên xwe yên rojane yên wekî xizanî, bêkarî û parçebûnên navxweyî ve mijûl bû û hîna jî mijûl e, ew lê bifikiriya jî ku kolonyalîzm sedema van pirsgirêkan e, nekariye xwe ji wê çerxê xelas bike û çareyên xwe bi pêş bixe. Lê di rastiyê de, gelek ji van krîzan encamên rasterast ên kolonyalîzmê ne, wekî hilweşandina avahiya aborî û talankirina çavkaniyan, lê her wiha rûnandina çerxên têkiliyên kapîtalîst ên xwe disipêrin bajêr. Ev mijûlî rê li ber mirovan digire ku bi rêkûpêk dîroka xwe binirxînin û wêjeya têrker biafirînin da ku êşên xwe yên di serdema kolonyalîzmê de vebêjin. Her çend pirtûk û berhemên ku bi vê serdemê re mijûl dibin hebin jî, gelek ji wan marjînalîzekirî yan jî nenas dimînin, mîna ku li ser wê serdema bi êş bêdengî hebe.

Ziman û kolonyalîzm

Yek ji xuyangên herî berbiçav ên kolonyalîzmê meseleya ziman e, ji ber ku hîbrîdasyona zimanî yek ji xuyangên têkiliya bi zorê yan jî bi dilxwazî di navbera çandan de ye. Hîbrîdasyona zimanî têgehek e ku behsa têkiliya di navbera du yan jî zêdetir zimanan de dike wekî encameke serdestiya çandî û siyasî, ku tê de ferheng û îfadeyên ji çandên cûda li hev dicivin da ku zimanekî nû ava bikin. Di rewşa Kurdî de, ku zimanê dayikê yê Kurdan e, dema ku hêmanên Erebî têne destnîşan kirin, hîbrîdasyon dikare xuya bibe, nemaze di wan peywendan de yên ku çanda Erebî li gelek warên jiyanê serdest dikin (wek medyayê, perwerdehiyê û siyasetê). Ev têkiliya di navbera her du zimanan de nayê wê wateyê ku Kurdan dev ji zimanê xwe yê dayikê berdaye, lê belê tê wê wateyê ku gotareke hîbrîd diafirîne ku bandora Erebî li ser zimanê Kurdî nîşan dide.

Hîbrîdbûn weke amûreke berxwedanê

Li vir hibridî ne qelsî an teslîmbûnek e, geriyana ji nasnameyê ye, lê belê amûreke berxwedanê ye: bi saya van pratîkên zimanî, nasnameya xwecihî dikare di çarçoveyeke pirçandî de ji nû ve bi gewde bibe û xurt bibe, di heman demê de navendîbûna zimanê kolonyalîst jî were hilweşandin.

Em nikarin kolonyalîzm û baviksalariyê ji hev cuda bikin, ji ber ku her yek ji wan piştgiriya ya din dikir û hîna jî dike. Kolonîzasyon ne tenê dagirkirina axê bû, lê di heman demê de beşdarî xurtkirina avahiyên baviksalar ên bihêztir bû. Vê yekê ew fikr ava kir ku mêr otorîteya sereke ne, çi di malê de çi jî di civakê de. Vê yekê bi awayekî zelal bandor li ser rola jinan a di nava civakê de kiriye.

Stratejiya mêran a gunehbarkirina jinan

Her çiqas zimanê dayikê di avakirina nasnameya çandî de cihekî navendî digire jî, civaka baviksalar li gorî wê tevnagere. Têgeh û çanda civakî xwedî roleke mezin in di bandorkirina li tevgerên kesan de. Bav gelek caran li derveyî malê dixebite, lê dayik li hundir dixebite, ji ber vê yekê ew ji her hûrgiliyek tevger, perwerdehiya zarokan û heta paqijiya wan berpirsiyar e, her çend ew jinek karker be jî. Ji ber vê yekê, em gelek mêran dibînin ku heke zarok baş tevnegere, jinê sûcdar dikin, dayikê dikin berpirsiyara veguhestina ziman ji bo zarokan, û heke zimanê dayikê hînî zarokê nehatibe kirin, dîsa jin û dayik tên sûcdarkirin. Lê ya rastî, gelek dê û bav dixwazin zarokên xwe hînî zimanan bikin ên ku ew wekî 'bihêztir', 'biprestîjtir' dibînin, zimanên wekî Ingilîzî yan jî Erebî di hin rewşan de, di heman demê de giringiya zimanê dayikê paşguh dikin. Ev zext ne li ser mêran, lê tenê li ser dayikan tê kirin, mîna ku ziman û nasname berpirsiyariya wan tenê ye. Bi tevahî xwezaya têkiliya hevkariyê ya ku divê malbat li ser wê ava bibe, bi vê helwêstê tê paşguhkirin. Têkiliyên malbatî û rola cinsiyeta civakî li vir tên bikaranîn da ku barekî din tevî tevahiya berpirsiyariyê bixin stûyê jinan: Jin zimanê dayikê hîn dike yan jî hîn nake. Li vir em dibînin ku avakirina cinsiyeta civakî di dawiyê de dihêle ku jin tenê ji ber ku ew dayik e, vî barî hilgire. Ev jî dibe ku ji stratejiyên baviksalariyê be ku meyldar e ginehan bixe stûyê jinan. Û ev rewş bi serê xwe xizmetê dike ji armancên kolonyalîzma çandî re.

Ez dibînim ku neheqî ye heger mirov tenê dayikê berpirsiyarê parastina zimanê dayikê bibînin, mîna ku ew bi tena serê xwe li hemberî bandorên kolonyalîzmê li ber xwe bide. Di heman demê de, gelek mêr her hewlê didin ku zimanê "desthilatê" yan jî zimanê kolonyalîst hînî zarokên xwe bikin, û zimanê dayikê paşguh dikin. Civaka me ya baviksalar baran hemûyan dixe ser milê jinan û wan ji her 'têkçûnê' berpirsyar dibîne, êdî ev 'têkçûn' çi perwerdehî be çi jî çandî be, her çend perwerde berpirsiyariyek hevpar e. Ez bawer dikim ku divê em rolan ji nû ve binirxînin û fêm bikin ku berxwedana rastîn li malê dest pê dike: bi dabeşkirineke dadperwer a berpirsiyariyan û hişmendiyeke kolektîf ku ziman û nasname ne 'karên jinan' tenê ne. Divê em ne tenê di jiyanê de, lê di parastina bîr, dîrok û nasnameya xwe de jî hevkar bin, ku kolonyalîzmê hewl da ku jê bibe, û pergala baviksalar jî di vê yekê de alîkariya wê kir.

*** Xwendekara Zanîngeha Rojava, Fakuteya Zanistên Civakî, Beşê Jineolojiyê.**

Ew zimanê me tine dike em heyranê wê ne!

Zilaman û zarokan bi zimanê dewletê dizanîbû û ew pêşketî dihatin dîtin, û xwe kiribûn heyranê dewletê. Tişta herî zêde bala min dikişand ew bû ku dewlet zimanê me tine dike, em jî hayranê wê ne.



Aya SALIH*

Ez dibêjim, bi derketina baviksalariyê re dewlet derket holê. Dewlet rengê desthilata li ser civakê bû. Malbata li gorî vê esthilatê jî desthilat dida û îro jî dide mêr. Dewlet weke xwe nema, di serdema nû de netewperestî derxistin holê û heta bi dewleta netewe ve perisî, veguherî. Vê dewleta netewe xwe wisa ava kir ku her tişta xwe di ser a civakê re bide qebûlkirin: Zimanê dewletê yê herî pêşketî ye. Netewe dewlet jî ji xwe bi yek zimanî diaxivî. Ji ber wê, di civakê de zilaman dixwest xwe bikin dewlet.

Gava em berê xwe bidin saziya malbatê, weke dewleteke piçûk hatibû sêwirandin û îro jî wiha ye. Ez ji Rojavayê Kurdistanê me. Ez dikarim bi rehetî bînim ziman ku ji ber netewe dewleta bi navê Sûriyê, Rojava jî xistibû nav sînorên xwe, zimanê Erebî zimanê herî baş dihat dîtin. Ji ber ku baweriya bavên me yên xwedî zêhniyeteke lawaz, em xistin xefka dewletê û hiştin em zimanê xwe ji bîr bikin ji bo pêşketî werin xuyakirin.

Hêdî hêdî nexasim li dibistanan, lê her wiha bi amûrên medyayê jî mejiyê zarokan jî hat asîmîlekirin. Zilaman û zarokan bi zimanê dewletê dizanîbû û ew pêşketî dihatin dîtin, û xwe kiribûn heyranê dewletê. Tişta herî zêde bala min dikişand ew bû ku dewlet zimanê me tine dike, em jî hayranê wê ne. Lê jin paşvemayî dihat dîtin û zimanê xwe nas dikir, lê wekî bêziman dihat dîtin, ji ber ku ne ji mafê wê ye ku bixwîne û nas bike, pêşketin ji jinê re qedexe bû. Lê dema mesele tê ser çanda zimanê dayikê, jin tê tewanbarkirin ku zarokê xwe hîn nekiriye zimanê dayikê, lê ya rastî ew e ku ew zarok ne weke yê wê dihat dîtin, heta ku ji mafê xwe bibîne. Û ez dixwazim behsa saziyên fermî yên perwerdê jî bikim, ew bi rola xwe rabûn ku em bi ziman û dîroka xwe nizanibin, em ji bîr nekin ku ew jî yek ji saziyên baviksalariyê ne. Heger we rol ji jinê re nehiştiye, hûn çima wê sûcdar dikin?

Zimanê mirov nasnameya mirov e û mirovbûnê dide îsbatkirin, heger ez xwedî li zimanê xwe dernekevim û nas nekim, wê demê ez tine me.

Her çiqasî mêtinkeriyê xwest me bike mêtingeh, gerek em zimanê xwe biparêzin, em sirê ziman û kevneşopiyên xwe nedin destê dewletan da ku li dijî me bi kar neyînin, bikaranîneke sosret a ku navê 'ez zimanê te diparêzim' lê dike.

* Xwendekara Zanîngeha Rojava, Fakuteya Zanistên Civakî, Beşê Jineolojiyê.

Mêtingerî û baviksalarî destûbirayên hev in

Rozalîn EBASÎ*

Kolonyalîzm diyardeyeke cîhanî bû ku bandorên wê li ser gelek aliyên jiyana siyasî, civakî û çandî li welatên ku rastî wê hatine, dirêj dikir û îroroj jî dirêj dike. Kolonyalîzm ne tenê dagirkirineke rasterast a leşkerî bû, lê belê sîstemeke yekgirtî bû ku armanc dikir gelan ji hêla aborî, çandî û rewşenbîrî ve bindest bike, bi vî awayî şêwazên serdestiyê ava bike ku piştî serxwebûna fermî jî dewam bike. Di vî warî de belkî em peyva Colonizing Structures (Avahiyên binyadî yên kolonîzeker** bi bîr bixin wê bi kêr hatî be. Bi destwerdana sîstema kapîtalîst di vê pêvajoyê de, avahiyên civakî yên nû derketin holê ku tê de hiyerarşiyên çîn û zayendî kûrtir bûn, û yek ji xuyangên wê yên herî berbiçav baviksalarî bû.

Linda Tuhiwai Smith di pirtûka xwe ya li ser Dekolonîzekirina Metodolojiya*** de nîşan dide ku kolonyalîzm ne tenê kirineke siyasî bû, lê belê projeyeke epîstemolojîk bû ku armanc dikir çandên xwecihî xira bike û gotareke akademîk a rojavayî wekî otorîteyeke gerdûnî ferz bike. Smith dibêje, kolonyalîzmê gelên xwecihî wekî mijarên zanîna rojavayî hilberandine, ne wekî hilberînerên wê.

■ Ferzkirina zimanekî biyanî perwerde veguherande amûreke çînî. Zanîna zimanê koloniyalîstan bû şertek ji bo bipêşveçûna civakî. Weke Edward Said dihizirî zimanê koloniyal ne amûrek, lê pîvaneke serdestiyê ye, lewma, rewşa hebûna vê pîvana serdestiyê, dihêle ku gelên koloniyal zimanê xwe yê dayikê wekî astengiyekê li pêşiya 'pêşketinê' bibînin.

Zanîna xwecihî weke amûreke berxwedanê

Kolonyalîzm ne kêliyeke dîrokî ya ji rabirdûyê ye, lê belê avahiyeke berdewam e ya ku bi rêya saziyên ziman, zanîn û perwerdeyê tê nûkirin, û tenê bi pirsîna rehên rewşenbîrî yên ku li ser wan hatiye damezirandin, dikare were hilweşandin . Ev yek, wekî Smith dibêje, dê têkiliya di navbera hêz û zanînê de hilweşîne û rewatiya zanîna xwecihî wekî amûreke ji bo berxwedan û rizgariyê nas bike.

Kolonyalîzm ne tenê meseleya dagirkirina leşkerî yan kontrola siyasî ye, lê belê pergaleke berfireh a serdestiya madî û sembolîk e ku bandorên kûr li ser avahiyên civakî, çandî, zimanî û perwerdeyî yên civakên kolonîzekirî hiştiye. Kolonyalîzmê guhertineke radîkal di şêwazên jiyanê de çêkirine û nasnameya kolektîf û bîra kolektîf li gorî perspektîfa xwe ya împeriyalîst ji nû ve bi gewde kiriye.

■ Kolonyalîzm ne kêliyeke dîrokî ya ji rabirdûyê ye, lê belê avahiyeke berdewam e ya ku bi rêya saziyên ziman, zanîn û perwerdeyê tê nûkirin, û tenê bi pirsîna rehên rewşenbîrî yên ku li ser wan hatiye damezirandin, dikare were hilweşandin . Ev yek dê têkiliya di navbera hêz û zanînê de hilweşîne û rewatiya zanîna xwecihî wekî amûreke ji bo berxwedan û rizgariyê nas bike.

Wateyê bindest dike

Kolonyalîzm ne tenê axê bindest dike, lê di heman demê de wateyê jî bindest dike. Bandora yekem û ya herî giring ferzkirina ziman bû, ji ber ku hêzên koloniyal hewl dan ku zimanên herêmî bi zimanên xwe yên wekî Fransî û Ingilîzî di rêveberî, perwerde û medyayê de biguherînin. Ji ber wê mirov dikare lê bihizire ku ev yek bêalî nebû û pergaleke nirxan a temam bi xwe re dianî ku zimanê resen wekî zimanê destpêkê dihesiband û gelê wê ji çarçoveya modernîte û zanînê derdixist: Ew ji siya-

setê û biryarên siyasetê jî dikirin der. Zimanê koloniyal ne tenê wekî amûreke ragihandinê, lê wekî amûreke kontrola sembolîk jî hate pêşkêşkirin; bi rêya wê, welatî difikire, dîroka xwe dinivîse û siberoja xwe xeyal dike.

Ev yek bû û hîna jî dibe sedema dûrketina ji zimanên dayikê û nemana zimanê dayikê. Ferzkirina zimanekî biyanî perwerde veguherande amûreke çînî; Zanîna zimanê koloniyalîstan bû şertek ji bo bipêşveçûna civakî. Edward Said, zimanê koloniyal ne wekî amûrekê, lê wekî pîvaneke serdestiyê didît, lewma, rewşa hebûna vê pîvana serdestiyê, dihêle ku gelên koloniyal zimanê xwe yê dayikê wekî astengiyekê li pêşiya 'pêşketinê' bibînin****.

Baviksalarî bi zarê koloniyalîzmê dike

Rewşa Kurdan jî mînakek bêkêmahî ya vê yekê bû. Zimanê Kurdan li welatên wekî Tirkiye û Sûriyeyê ketin ber siyasetên qedexekirin û jêbirinê. Ew ji xwendina bi zimanê xwe û weşandina pirtûk û rojnameyan bêparman e. Ev yek bû sedema xirabûna bîra zimanî ya tevahiya nifşan. Bi vî awayî, hêzên koloniyal hewl dan çanda herêmî ji holê rakin û nirx û çanda xwe li ser gelên kolonîzekirî ferz bikin, bi vî awayî adet û kevneşopiyên herêmî marjînalîze kirin. Di vê çarçoveyê de, Edward Said dibêje ku koloniyalîzm ne tenê projeyeke erdnîgarî yan leşkerî bû, lê belê projeyeke nasnameyî bû ku wêneyekî taybetî yê "Rojhilat" li hember "Rojava" hilberand. Di pirtûka xwe ya navdar "Orientalism" de, Edward Said nîşan dide ka 'Rojhilat' çawa wekî têgeheke bindest û egzotîk hatiye avakirin; wekî têgeh ew berevajî 'Rojava' ya ku wekî rasyonel û serdest tê pêşkêşkirin, hatiye avakirin. Di avakirina têgeha 'Rojhilat' de bi vî rengî hem rasyonelnebûn û hem jî bindestbûn hene. Ev dualîte ne nîşaneke rastiyê ye, lê belê avahiyeke îdeolojîk e ku xizmeta siyaseta kontrolê dike. Li vir, têkiliya avahîsaziya binyadî ya di navbera koloniyalîzmê û baviksalariyê de eşkere dibe. Çawa ku koloniyalîzm serdestiya ji derve li ser civakekê ferz dike, baviksalarî jî vê serdestiyê di nav civakê de ji nû ve hildiberîne.

Têkiliya di navbera koloniyalîzmê û baviksalariyê de

Lêkolîna têkiliya di navbera koloniyalîzmê û baviksalariyê de ji bo gihîştina di sîstemên zordar de yên ku di civakên kolonîzekirî de kok girtine, pir giring e. Her çiqas kolonyalîzmê xwest erd û çavkaniyan kontrol bike jî, kontrolkirina avahiyên civakî û çandî, bi taybetî jî sîstema baviksalar a ku wekî amûreke navendî ji bo xurtkirina kontrolê û xurtkirina serdestiyê dihat bikaranîn, ji bîr nekir.

Baviksalarî (Patriyarkî) avahiyeke (strukturekî) civakî ye ku mêran li ser jinan dike xwedî îmtiyaz, û di nav malbat û civakê de desthilatdariyê dide wan. Di nava gelek civakan de şêweyên hevsengiyê berî koloniyalîzmê jî hebûn û ew li ser bingehê şêweyên matrîlîneal an partîzanî ava bûn. Bi hatina kolonyalîzmê re, şêweyekî taybetî yê baviksalariyê ew baviksalariya ewrûpî ku bi xwedîtiya erdê û kapîtalîzmê ve girêdayî bû, hate ferzkirin. Di nava vê sîstema civakî de jin hatin marjînalîzekirin û ji meqamên biryardanê û tevlîbûna siyasetê hatin dûrxistin, û malbat li ser bingehê otorîteya mêr û mîrateya bavî ji nû ve hate rêxistin.

Koloniyalîzm û baviksalarî ne du sîstemên cuda bûn, lê belê hevdu xurt dikirin û xwedî li hev derdiketin, xwe ser hev re dikirin. Çawa ku zanyara Hindistanî Gayatri Spivak rave dike di gotara xwe ya navdar de ya ku tê de pirsa 'Ma bindest dikare biaxive?', jinên di civakên kolonîzekirî de ne tenê qurbanên baviksalariyê bûn, lê di heman demê de qurbanên gotarên koloniyal bûn ku ew bêdeng dikirin û di bin behaneya rizgarkirina wan de ew kontrol dikirin*****.

Koloniyalîzm şerê li dijî zimanê dayikê ye

Kolonyalîzmê zimanê xwe yê fermî wekî amrazekî ji bo dûrxistina zimanê dayikê ferz kir, bi vî awayî jinên ku hilgirên çanda devkî bûn, marjînalîze kirin. Perwerdehiya kolonyal bi rêya bernameyên xwendinê yên ku otorîteya mêr û koloniyal misoger dikirin û xwe li rolên jinan di dîrok û çandê de kor dikirin, baviksalarî ji nû ve hilberand. Her wiha, jin neçar man ku zarokên xwe bi zimanê mêtinger mezin bikin da ku întegrebûna wan bi pergala perwerdehiya nûjen re misoger bikin. Wekî nimûne, li Sûriyeyê, jinên kurd neçar man ku zimanê erebî fêrî zarokên xwe bikin ji ber ku zimanê kurdî di dibistanan de qedexe bû, vê yekê jî dayik kir amûreke zorê ji bo veguhestina nasnameyeke zimanî ku ne nasnameya wê ya resen bû.

Nasnameya çandî jî di çarçoveya projeyeke koloniyalîst a baviksalar de ji nû ve hate sêwirandin, ku jin bi têgehên rûmet û şermê ve hatin girêdan, û ew kirin sembolên ku li ser navê çand yan dîn çavdêrî li wan bike û wan kontrol bike. Perwerdehiya malbatî bûye mijara şêwazekî koloniyal ê baviksalar ku jinan dike îtaetkar û mêr dike rêber.

Postkolonyalîzm û berdewamiya hegemoniyê

Piştî bidawîbûna koloniyalîzma rasterast jî, bandorên wê di saziyên civakî, çandî û perwerdeyî de man. Wekî ku Linda Tuhiwi-Smith di pirtûka xwe ya bi navê Decolonizing Methodologies de bi argûmanên xurt îfade dike, zanîna ku ji kolonyalîzmê mîras girtiye, di şêweyên nerm de serdestiyê çêdike. Sîstemên perwerdehiyê yên modern, polîtîkayên dewletê û medyayê, berdewam dikin bi hilberandina sîstema koloniyal-patriarkal ku jinan dixe bin bandora xwe û serdestiya mêran û dewleta navendî rewa dike.

Gotara postkoloniyal her wiha bal kişand ser berdewamiya baviksalarî wekî amûreke kontrola civakî û siyasî. Jin hîna jî wekî sembola nasnameya neteweyî, li meydaneke têkoşînê ya di navbera modernîte û kevneşopiyê de têne bikaranîn, û pir caran neçar dimînin ku bi zimanekî taybetî biaxivin û reftaran qebûl bikin ku xizmeta wî awayê civakê dikin, yê ku ji hêla mêran yan desthilatdaran ve tê xwestin.

Têkiliya di navbera koloniyalîzmê û baviksalariyê de ne dîrokeke rabirdûyê ye, lê belê sîstemeke zindî ye ku berdewam şêweyên nû yên kontrolê hildiberîne. Her çend koloniyalîzma siyasî li gelek welatan bi dawî hatibe jî, pergalên wê yên têgihîştinî, çandî û perwerdeyî hîn jî berdewam dikin. Têkoşîna ji bo hilweşandina van sîsteman têgihîştineke kûr a têkiliya hêzê ya di navbera kolonyalîzmê û baviksalariyê de, û cihê jinan di vê çerxerêyê de, ne tenê wekî qurbanî, lê di heman demê de wekî aktor jî, hewce dike.

Li şûna encamê

Lêkolîna li ser têkiliya di navbera kolonyalîzm û baviksalariyê de ku desthilatdarî çawa dikare xwe di şêweyên hevûdu de ji nû ve biafirîne, jin wekî hedefa hêzên koloniyal û sîstemên baviksalar bû, rizgariya rastîn ne tenê di têkoşîna li dijî dagirkeriyê de ye, lê di heman demê de di bandorên wê dagirkeriyê li ser avahiya çandî û civakî de ye jî. Tişta ku îro pêwîst e ev e ku ev mîras were hilweşandin û xwendineke rexneyî ya radîkal a wê were bidestxistin ku rê bide ji nû ve dabeşkirina rolan û naskirina rola jinan wekî pêkhateyeke çalak a dîrokê, ne wekî qurbaniyên bêdeng.

* Xwendekara Zanîngeha Rojava, Fakulteya Zanistên Civakî, Beşê Jineolojiyê ye. Wê ev nivîs ji bo dersa Dekolonîzekirina Metodolojiyan nivîsî.

** Mudimbe ev têgeh ji bo ravekirina bi minhacên (bernameyên xwendinê yên) rojavayî jî xilasnebûna ji têkiliyên koloniyalîst bi pêş xist. Bi ya wî avahiyên binyadî yên kolonîzeker, tevî ku koloniyalîst çûne jî dikin ku zanîngeh (yan jî rêxistinên din) ji bo berjewendiyên kolonîzekerên berê yan jî bi berjewendiyên paytextên kolonîzeker bixebitin. Binihêre li, Mudimbe, V.Y. 1988. The Invention of Africa: Gnosis, Philosophy, and the Order of Knowledge. Bloomington: Indiana University Press.

*** Smith, L. T. 2021 (çapa yekem 1999). Decolonizing Methodologies: Research and Indigenous Peoples. London: ZED Books.

**** Said, Edward (1978). Orientalism. London: Vintage Books.

***** Spivak, G. C. 1988. Can the Subaltern Speak. Di nava: Patrick
William û Laura Chrisman (ed.), Colonial Discourse and Postcolonial
Theory. New York: Colombia University Press.

■ Koloniyalîzm û baviksalarî ne du sîstemên cuda ne, lê belê hevdu xurt dikin û xwedî li hev derdikevin. Gayatri Spivak rave dike bi pirsa 'Ma bindest dikare biaxive?' ka çawa jinên di civakên kolonîzekirî de ne tenê qurbanên baviksalariyê bûn, lê di heman demê de qurbanên gotarên koloniyal bûn ku ew bêdeng dikirin û kontrol dikirin.

Mêtingeriyê çawa xwecih weke 'yên din' ava kirin?

Zehrîban HISÊN*

Serdema Ronakbîriya Ewrûpî ya ku ji dawiya sedsala 17'an heta dawiya sedsala 18'an bi tesîr e, gelek felsefevan û rewşenbîran dihewîne. Ev feylesof û rewşenbîr bi mebesta guhertin û veguhertina sîstema ku tê de desthilata mutleq a melik heye, dêr li meydana siyasî û civakî xwedî hêza biryarê ye, li ser hîmên felsefê mitaleyên xwe dinivîsin û belav dikin. Hizreke belav dibêje, ew bi armanca ku ji çanda bindestiya li hember dêrê rizgar bike, derketiye holê. Lê gelek felsevanên ronakbîriyê yên bi tesîr bawermend û dilsozên dêrê û heta dêra katolîk jî bûn; mirov li Newton û Descartes tenê jî binihêre, bi rehetî vê yekê dibîne. Naxwe, ne dûrî aqilane ku ev efsaneya hanê encama xwedanqebûlkirina zanistperestiyê di nîvê duyem ê sedsala 19'an de be. Ev mijareke din a berfireh e. Ji ber wê, em bibêjin, mesele bêhtir derketina pêş a humanîzmê ye li aliyekî, li aliyê din jî şikandina sînorên dêr û dewleta kevin li ber çîna kapîtalîst (burjuwaya xurt dibû) datanî.

Ez dixwazim çend mînakên felsefevanan bidim yên ku ev pêvajo bi rê ve birine; yên ji wan herî zêde tesîr kirin jî ev in: Isaac Newton, René Decartes, Jean-Jacques Rousseau, Voltaire (yan jî François-Marie Arouet), Immanuel Kant û John Locke. Min navê van rêz kir ji ber ku nihêrîn û hizrîna wan ji wê demê heta niha pirr bi ziravî bandor li jiyana me dike. Piştî van Auguste Comte felsefeya pozîtîvîzimê bi pêş dixe. Yanî ew hemû bi hev re ji bipêşketina pozîtîvizmê re dibin bingehek. Pozîtîvîzma ku bi encamên xwe yên di zanistên xwezayî de tetbîqî xwe serketî dît - helbet nirxandinên ku vî hukmî jî dixin ber lêpirsînê hene - tesîreke mezin li zanistên civakî jî kir û vê yekê bi xwe re çareseriya pirsgirêkên civakê neanîn.

Weke neinsan avakirina mêtingehan

Bi her halî, helbet dema em behsa van deman, û jê û bi şûn ve dikin, hêdî hêdî Ewrûpa xwe weke navend û çavkaniya zanist û zanînan dibîne. Ev hişmendî jî bi awayekî kûr di serê mirovan de tê bicihkirin. Hema bibêje, êdî ji bo xwe her karî û her kirinê rewa dibînin. Ji bo peydakirina bazarên nû ji împaretoriyên xwe re wan welat dagir kirin û di bin navê zanakirina 'yên din' de ev dagirkerî û mêtingerî rewa kirin. Bi zanistên xwe yên civakî li ser rêbaza pozîtîvist wan rewakirin sereqet avakirin û hilberandin. Em dibînin ku ew mêtingeriya xwe jî ne weke mêtingerî şirove dikin, lê weke rizgarkirina 'yên din' ên nezan şirove dikin. Em di vegotina dîrokê û di vegotinên antropolojîk û encamên zanistên din ên beşerî de û her wiha di raya giştî de dibînin ku miletên mêtingehan êdî weke neinsan ava dikin. Ew ê neinsan jî ne ji mafên wî ye ku dîroka xwe vebêje. Tenê Ewrûpiyên ku insanên kamil û aqilane ne dikarin hem ji bo mêtingehkiriyan û hem ji bo mêtingeran bipeyivin.

Xwe li ser hîmên yên din avakirin

Di vî warî de Abdulah Ocalan di pirtûka xwe ya ku tê de behsa peywendiya dîrok, roja me ya îro û mirov de (1997) dibêje, "Mêhtinger derheqê hunerê gelên xwecih de hewl didin komkujiyan bikin, ji ber ku huner aliyê manewî, rûhî û eslê civakên xwecih di nava xwe de dihewîne, lê ji ber hunera eslî nayê veşartin, van komkujiyan qebûl nake" (Ocalan 1997: 27-64). Maneya vê yekê ew e ku mêhtinger bi her awayî çand û zimanên 'ên din' qir dike û biçûk dibîne, ji bo ku xwe li ser çanda wan û esasê wan ava bike.

Di dîrokê de mînakên vê gelek in. Dema ingilîzan welatên Hindê kolonîze kirin, Fransayê Cezaîr kir mêhtingeh, yan jî welatên împeriyal ên Ewrûpî temamê Efrîkayê kirin mêhtingeh. Ev çend mînakên berçav in, û heta niha jî bandora mêhtingeran li ser gelên xwecih heye. Yek ji van bandoran ku mayînde bûye ziman e: Li geek welatên Efrîkayê zimanên fermî Fransî û Ingilîzî e. Li welatên weke Cezaîrê jî ku zimanê fermî Erebî ye, Fransî de facto zimanekî fermî ye. Ji bilî wê sîstema aborî ya weatên Efrîkî jî ji bo pêdiviyên bi çavkaniyên sererd û binerd ên welatên Ewrûpî dixebite; yanî aboriya van welatan îro jî li gorî pêdiviyên navendên hêzên koloniyal ên berê hatiye avakirin. Û hê jî Ingilîz li ser siyasetên Hind û Çînê bi tesîr in (vegerandina Hong Kongê a bi şert di sedsala 21'ê de qewimî).

Antropolojî weke sîleh

Helbet di kolonîzekirinê de sedemên siyasî, aborî û çandî derdikevin pêş. Di pêkanîna van armancan de mêtinger her cure û şêwazan bi kar tîne. Dema Inglîz çûne Efrîkayê û ew kirine mêtingeh, zanista antropolojiyê bi pêş xistine. Heta ji bo neinsankirina mirovên li Efrîkayê, antropologan hestûyên mirovan pîvane ji bo qaşo lêkolînên li ser nijadan. Ev zanist hemû jî hatine bikaranîn ji bo hilberandina rewabûnê ji bo mehtingerkirina welatê wan mirovên 'neinsan'.

Tevî ku zanist a civakê ye û bi destê civakê bi pêş dikeve, împeriyalîst zanistê dikin amûreke di destê mêtingeran de, û ew tenê di nav çînekê de dimîne. Ev hişmendî dibe bingehê kûrkirina mêtingeriyê.

Û ji ber ku Serdema Ronakbîriyê di nava serdema nû de weke serdema zanabûn û civakbûnê tê nasîn, di avakirina îdeolojiyên navendî - yan jî ew îdeolojiyên ku sîsik in - de rola wê gelekî li pêş e .

Ji encamên nivîs û fikrên zanyar û felsefevanên Serdema Ronakbîriyê ye ku dîn û dewlet li Ewrûpayê ji hev cûda bûn. Di encamê de ya derkete holê, tevî ku weke destketiya hemû civakan hat dîtin jî, di heman demê de huner, çand û zanabûnên beriya wê înkar dikin.

Stratejiya dejenere bike û bi kar bîne

Rustem Cûdî di pirtûka xwe ya li ser îdeolojiyê de (2014) nexasim di herdu beşên li ser îdeolojiyên resen ên serdemên navîn de û beşa nasnameya îdeolojiya kapîtalîzmê de, dibêje, destpêka derketina dînan de, nexasim a xiristiyaniyê de, Împaretoriya Roma wê qebûl nake û bi sedan û hezaran însanên vî dînî dihebînin, dikuje. Ew dibêje, heman tişt ji bo dînê Îslamê jî lê ye. Li gorî wî, gava sîstema birêvabirinê gel dixetime, neçar dimîne ku dîn qebûl bike, lê belê vê jî bi guhertina li gorî şertan ava dike û dîn dike aîdê dewletê. Rustem Cûdî heman fikrî ji bo zanistê jî wisa şirove dike. Destpêka derketina zanistê, vê carê dêr wê qebûl nake; yanî dibêje dêr ji xwe zanistî ye. Beriya wê em dibînin ku deshilata dîn û dewletê bi hezaran jinî di bin navê nêçîra pîrhebokan de qetil dike, pê re jî zanyar û felsefevanan jî. Lê belê, dema gel bi awayekî gîştî fikrên zanistî diecibînin û tevlê dibin, wî çaxî dêr yan dewlet neçar dibe ku zanistê qebûl bike. Gava vê dike jî bi şertên xwe wê ji nû ve ava dike. Li şûna zanistê êdî zanistperestî bi pêş dikeve. Wisa insanên çermspî vê zanistê weke ya wan e, pênase dikin û li gorî berjewendiyên desthilatdariyê zanist dixebite.

Di vê şiroveyê de em dikarin berevajîkirina heqîqetan bibînin û bandora wê li ser avakirina kolonîzekaran û civakên kolonîzekirî bi awayekî rasterast bibînin.

Çavkanî

Ocalan, Abdullah (1997). Tarih günümüzde gizli ve biz tarihin başlangıcında gizliyiz. Bêyî cihê we anê: Weşanên Serxwebûn.

Cûdî, Rustem. 2014. Îdeolojî. Enqere: Weşanên Aram

* Xwendekara Zanîngeha Rojava, li Fakulteya Zanistên Civakî, Beşa Jineolojiyê.

Tecrûbeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo azadiya jinan

Bêrîvan MECÎD - Sorgul EBDULSELAM
Zozan MIHEMED*

Yek ji pirsgirêkên bingehîn li Rojhilata Navîn, newekheviya zayendî ye, ya ku bi têgeha cinsiyeta civakî (gender) tê îfadekirin. Heta, mirov dikare wê weke çavkaniya pirsgirêkên civakî û sîyasî binirxîne. Li her aliyê cîhanê, ruhê berdewamiyê bi saya cihêrengiyê ye, ev cihêrengî dibe meydana afirandin û berdewamiya jiyanê, ne ku yek ya din ji holê rake. Li ser vî bingehî têgeha cinsiyeta civakî û bipêşketina zayendperestiyê di nava civakê de rastiyekê radixe ber çavan: Pirsgirêkên ji ber cinsiyeta civakî dibin kelem li pêşiya siberoja mirovahiyê.

Em bi gender bi maneya wê ya cinsiyeta civakî dakevin. Têgeh di dawiya serdema navîn de dide der, lê hîna nû bi ronesans, ronakbîrî û Şoreşa Pîşesaziyê re li Ewrûpayê belav bû. Piştî vê serdemê têkoşîna nexasim ji bo mafê tevlîbûna pêvajoyên siyasî (mafê dengdanê) li navenda tevgera ji bo mafên jinan bû. Li gel rêxistinên mafê mirovan û tevgerên civakî û siyasî xebatên azadiya zayendî bi pêş ketin. Li ser vî bingehî banga mafên jinan jî wek zayendeke azad bi berfirehî li çar aliyê cîhanê belav bû. Ev doza wê ya sereke, sererastkirina nerînên çewt ku pergalên civakî û olî, wek qanûnên ferzkirî li ser ferd û kesayeta her zayendê da rûniştandin. Bitaybetî jin ku weke zayenda herî qels û bê çare hatiye dîtin, herwiha zayenda jin weke kesayeta ku herî zêde ji cewherê xwe ê dîrokî hatiye valakirin û astên herî bilind ji koletiyê li ser hatiye ferzkirin, tê dîtin. Ev rewş heta radeyekê li welatên Ewrûpî hatiye çareserkirin bi rêka qanûnan, lê belê li Rojhilata Navîn heta niha gelek tevgerên olperest û nijadperest hiştine jin li derveyî qada siyasî, rêveberî, leşkerî û civakî bimîne.

Dîroka mirovan çi qasî dirêj kiribe jî tê de herdû zayend bi hev re jiyane, ristên pêşketin û zanebûnê bi hev re hûnandine, û gava ev kirine dûrî newekheviya nasnameyî ya îro heyî bûne. Bi guherîna pergalên dîrokê re û bi derketina zêhniyeta desthilatdariyê, civaka baviksalar dest pê kir, di vê civakê de mulkiyeta taybet bi pêş ket, zilam xwe xwediyê erdê û kedê nîşan dide. Di civaka baviksalar de desthilat jinan jî weke yekê ji wan alavan dibîne yên ku ji bo xwe bi kar tîne û weke milkê xwe di saziya malbatê de dixwaze ava bike. Nasnameya jinê jî hate çarçovekirin di nava sînorên karên navmalê û wekî alaveke kêfxweşiya zilaman hate avakirin. Bi demê re ev nasnameya jintiyê hate rewakirin û weke rewşeke normal hat qebûlkirin, di encamê de ev yek bû weke adeteke civakî ku nasnameya zayendî ne li gora xwezayê, lê li gora adetên civaka baviksalarî hate çêkirin. Ji bo vê yekê ger em bi çavekî vekirî û rasterast li rewşa zayendî di civakê de binêrin, em ê bibînin ku zayenda mêr xwe wiha ava kiriye, di her qada civakê de wekî împaretorekî xwediyê her hêzê, erd û ezman yên wî ne xwe dibîne. Lê jin herdem ew zayend e ya ku girêdayî ye, nikare bi îradeya xwe tevbigere, beşek ji mulkiyeta zilam e. Çawa tenê yek ji cinsan karibû ku xwe wekî cewherê yekane ferz bike, karîbû peywendiya ku wî bi cinsê din ve girêdide înkar bike, wekî din xwe pak diyar bike. Hingê jî pirsa ev jina civakî ya îro heyî ji ku hat, tê pêşberî me? (de Beauvoir 2008: 10).

Ev yek dibe encama dîrokeke binakok, tê de nasnameya jinê tê fetisandin, tenê di karên navmalê, anîna zarokan û zêdekirina hejmare malbatê de mijûl dibe, ev jî dibe yek ji nîşanên ku zilamtiya mêran îsbat dike. Li ser vê yekê Nawal Alsadawî dibêje, "Gelek kes li ser sedemên ku civaka jinan li gorî mêran rêzeke nizmtir de dihêle, li ser wan sînor û zextên tê ferzkirin, lê ew sînor û zext li ser mêran nayê ferzkirin û di jiyanê de rolek taybet dide jinan ku ew jî bi piranî xizmeta navmalê û guhdana zarokan e."(Alsadawi 1990: 70). Hişmendiya malbatê ku bi serkêşiya zilam tê avakirin di hundirê wê malbatê de her tiştî milkê zilam e, jin û zarok li ser navê zilam têne tomarkirin, ev malbat dibe dewleta piçûk a zilamî. Di nava malbatê de ya serweriya wî her rêbazê dikare rewa bike û yek ji bendên nasnameya wî ya zilamtiyê diparêze ol û adetên civakê ne. Derbarê vê mijarê de Abdullah Ocalan bandora malbatê li ser nasnameya cinsî li ser çar bendan şirove dike. Ev jî ev in:

- Veguherîna otorîter bi navendkirina mêr li ser malbatê tê ferzkirin ku bibe şaneya civaka dewletê.
- Xebata jinan bê sînor û bêyî ku mesrefeke wê hebe tê misogerkirin.
- Ji bo ku nifûsa pêwîst peyda bike zarokan tîne dinyayê.
- Hilweşîn, paşketin û koletiyê di nava tevahiya refên civakê de, weke modêleke fonksiyonê belav dike. (Ocalan 2018)

Newekheviya zayendî yek ji encamên îdeolojiya desthilatdariyê ye ku tê de zilamperestî bi hêz e û serweriyê bi pêş dixe, û jinê bi jintiyeke reben û pepûk bi cih dike. Di civaka baviksalarî de di her warî de nasnameya jinê windayî ye di warê leşkerî, siyasî, aborî û civakî de. Li ser vê bingehê Simone de Beauvoir nihêrînên li ser parastina mafê jinê bi pêş dixe. Ew dibêje, di nava malbatê û bi destê civakê mêr ji sê heta çar salî wekî 'zilamekî piçûk' tên mezinkirin, û jin jî hê ji wî temenî ve fêrî jinbûyinê dibin (de Beauvoir 2015: 475). Yanî civak her du cinsan jî ava dike. Pê re jî her diu cins jî di nava saziya zewacê de ne bextewer in (de Beauvoir 2015: 475-478). Ev mijar hemî dikevin bin navê cenderê ku nahêlin civak bigihêje siberojeke saxlem û aram.

Ji ber vê yekê em balê dibin ser rewşa nûjen a li Sûriyê, ji ber ku Şoreşa Sûriyê a bihara 2011'an derfet li ber hin guhertinên civakî û siyasî da vekirin. Nexasim li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya ku sîstema Rêveberiya Xweseriya Demokratîk tê de hat avakirin, stûnê vê sîstemê yê bingehîn beşdariya jinê li her warê rêveberî, siyasî, leşkerî û civakî ye. Ev tecrûbe dixwaze bibe dewama banga azadiya jinan li tevahiya Sûriyê. Weke destpêk bi rêya akademiyên perwerdeyên giştî û yên xweser li piranî bajaran jin û mêr perwerde kirin. Naveroka perwerdeyê jî dîroka jinan, çawaniya windabûna nasnameyê jinan û çawaniya xwendina kesayeta jinan di roja me ya îro de bû. Herwiha damezrandina Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) di 4'ê Nîsana 2013'an de bû gava herî mezin di rêya azadiya jinan de, herwiha di vê sîstemê de rola meclisên xweser yên jin û sîstema hevserokatiyê bingehîn bûn, ev rewş zemînekî ava dike ku tevgerên sivîl yên azadiya jinan werin avakirin. Sermeselê, Kongra Star ji 2005'an bi navê Yekîtiya Star karê xwe dimeşand û di salên şoreşê de çalak bû; Mala Jinan, Rêxistina Sara ya li dijî tundiya li ser jinê û hwd nimûneyên din in. Em niha berê xwe bidinê gelo tecrûbeya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, dikarîbû bibe bersiv ji bo pirsgirêkên zayendî û heger erê, çawa? Ji bo vê jî pirsên hanê wê rê li ber me vekin:

- Sîstema Rêveberiya Xweseriya Demokratîk bi çi rêbazan nêzîkî pirsgirêka newekheviya zayendî bû?
- Ev tecrûbe gelo çawa dikarin bibin mîrasek û li temamê Sûriyê were bipêşxstin?

Tecûrebeya Meclîsa Jinan

Di her du sedsalên bihurî de bangên ji bo azadiya jinan xurt bû. Dengên doza azadiya jinan dikirin, bûne pêleke ronakbîriyê. Li gorî şert û mercên aborî, çandî û siyasî yên civaka xwe armancên wan diyar dibûn. Ji ber vê yekê, ew bangên ji bo azadiya jinan bûne neynikek ji wan şert û mercan re jî. Em fêm dikin, Virginia Woolf dengê xwe ji bo guherîna van mercan bilind dikir. Gava ku dixwest mekanekî jinê yê ewle û xweser hebe, wê îşaret bi şertên wê yekê dikir ên ku jin karibe azadiya xwe di nava wê civakê de bi wan biafirîne. (Ghaderi 2006, 120)

Şoreşa Rojava li Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke beşek ji vê têkoşînê, ji ber wê jî navê Şoreşa Jinan lê tê kirin. Jinan li vê herêmê bi îradeyeke xurt li her warî cihê xwe girt. Ew jî bi avakirina Meclisa Jinan li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê misoger bû. Ev meclis bû sîwanek ji bo tevahiya jinan ji pêkhateyan hemûyan.

Jinan di Şoreşa Rojava de gelek destketiyên mezin bi dest xistine. Yekem tevgera ku beriya şoreşê hatibû avakirin, tevgera Kongra Star bû di sala 2005-2006 an de. Lê piştî Şoreşa Rojava gelek tevger û rêxistinên jinan ên cuda hatin avakirin. Ev rêxistin bi pêş ketin û sîstema hevserokatiyê di nava wan de da avakirin. Jinan xwe di rêveberiya xweser û saziyên civaka sivîl de bi pêş xistin û bi rê xistin. Li her cihî kar û xebat dikirin, ji bo wê jî sîwanek pêwîst bû ku van tevger û rêxistinan li hev kom bike. Kongra Star weke i-înîsiyatîfekê pêşniyaz kir ku ew sîwan bibe cihê biryar, qanûn û nîqaşkirina pirsgirêkên jinan di warên siyasî, aborî û civakî de. Jinan hêzeke mezin ji jinên leşkerî girtin piştî têkçûna terora DAIŞ'ê. Êdî jin bi awayekî komî tevlî her warê civakê bû.

Înîsiyatîfa Kongra Star bi serdana rêxistin û partiyên siyasî hemûyan dest pê kir, ji ber ku her rêxistin ofîsa wê ya jinan heye, di hin partiyan de Meclisa Jinan heye. Wekî din, serdana herêmên din jî yên weke Tebqa, Reqa, Dêrezor û Şehbayê kir. Her kesî ev înîsiyatîf erênî dîtin, her wiha dîtin ku sîwanek baş e ji bo komkirina jinan. Piştî hat erêkirin, kongreya damezrêner a vê meclisê çêbû û tê de komîteyeke ji jinên siyasetvan, saziyên civaka sivîl û Kongra Star ên ji pêkhateyên sereke (Kurd, Ereb, Suryan, Ermen û Çeçan) hat avakirin. Nûnerên her pêkhateyekê derxistin. Karê vê komîteyê, amadekirina kongreya yekem bû. Armanca kongreyê diyarkirina nav û cih bû. Di dawiya kongreyê de êdî lihevkirinek çêbû ku nav bibe Meclisa Jinan a Bakur

û Rojhilatê Sûriyê (HVD 19: 06.06.2024).

A- Çar komîteyên Meclisa jinan

1-Komîteya Zagonî:

Zagona Jinan di sala 2014'an de li Kantona Cizîrê hat derxistin. Malên Jinan jî hatin avakirin. Wan hewl da ku zagonekê binivîsin a ku mafên jina pê bêne parastin, sermeselê, pêwîst e jin û mêr di her aliyî de wek hev bin û di mafên mîrasê wek hev bin. Li gorî rewşa Mala Jinan ev zagon bi awayekî pratîk pêk hat. Ji bo wê, dema zagonek derdikeve, xwe dispêre 26 prensîpên ku Komîteya Zagonî ya Meclisa Jinan ew danîne. Ji wan prensîpan ên sereke ev in: Mafê jiyanê pîroz e û bi rêya zagonan û bêcudahî tê parastin. Wekî din, divê îdeolojiyên li ser bingehê baviksalarî, zayendperestî, netewperestî û olpersetiyê bên guhertin. Pê re, têkiliyên malbatî yên civakî li ser bingehê serxwebûna zayendî û avakirina malbat û civakeke demokratîk bêne bipêşxistin. Bi ser de jî beşderabûna jinan di pêkanîna siyaseta giştî ya Rêveberiyên Xweser de were misogerkirin. Pêwîst e pabendîbûna bi van prensîpan li tevahiya astên rêveberiyê de û di wergirtina postan li tevahiya sazî û dezgehan de li pêş be. Lazim e her wiha di warê siyaseta demokratîk û bipêşxistina wê de jin werin teşwîqkirin û mirov destekê bide jinan (HVD 21: 15.6.2024).

Komîteya Jinan a zagonî ya ku di Meclisa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de cih digire, ji endamên Meclisa Dadmeniya Jinan ên dadgehê pêk tê. Dema ku li ser zagonekê tê nîqaşkirin, ev endamên jin ên dadmendiyê, kesên civakî û yên xwedî tecrûbe dicivin û nîqaş dikin. Dema ku zagona fermî derdikeve, wê pêşkêşî Meclisa Gelan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin, weke zagona malbatê. Zagona malbatê tenê li Kantona Cizîrê hat derxistin, lê li herêmên din wek Tebqa, Reqa û Dêrezorê pêk nehatiye, ji ber ku hîn nepejirandine. Lê her dem semîner û perwerdeyên cuda tên lidarxistin weke karê ronakbîriya civakê di biwara mafên jinan de (HVD21: 18.6. 2024).

2-Komîteya Destûrî:

Li her devera cîhanê jin ji komîteyên destûrî yên danîna zagonan hatine dûrxistin. Lê komîteya destûrî ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, dihizire ku jin dikarin biryaran bidin, ji bo cihê xwe di nava siyasetê de bigirin. Gelek jin hene hevserokên partiyan in û bi awayekî serketî wan partiyan bi rê ve dibin. Heta ku çareserî jî li Sûriyê pêk were, divê mafê her kesî tê de hebe û her maf were parastin. Ji bo wê jî ji her pêkhateya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nûneran cihê xwe tê de girt. Di salekê de tevahî destûrên cîhanê xwendin, ji bo ku karibin sûdê ji wan wergirin. Piştî wê, reşnivîsek amade kirin û diyar kirin ka wê nihêrînên jinan ji bo destûra Sûriyê çi bin û wê rola jinan li Sûriyê çawa be. Du yekîtî hene, yek ji wan Yekîtiya Neda ye ku rêxistina jinan e. Ya din jî Yekîtiya Jinan e. Her du ji bo jinên Filistînê helwestên xwe bi hev re derdixin. Wekî din jî, Rêxistina Înîsiyatîfa li dijî Dagirkeriyê û Qirkirina Jinan ji bo ewlekarî û aştiyê kar dike. Ew di asta Rojhilata Navîn tenê de ye. Nûnereke jin ji Meclisa Jinan cihê xwe tê de digire, ji bo ku têkilî di navbera van jinan de çêbe û pirsgirêk bên naskirin. (HVD21: 19.06.2024)

3-Komîteya Ragihandinê:

Ev komîte siyaseta ragihandinê ya meclisê diyar dike, serpereştiya malper û rûpela meclisê dike û malperê dewelemend dike, her wiha materyalên medyayî li gorî nihêrîna meclisê peyda dike. (Rêziknameya Meclisa Jinan 2021: 8) Ev komîte her kar û xebata Meclisa Jinan li ser rûpela fermi radighîne. Dema ku ev meclis konferans û civînên xwe li dar dixe, vê yekê radighîne.

4-Komîteya Darayî:

Ew raporên darayî yên mehane amade dike û wan di civînên desteya giştî de pêşkêş dike (Rêziknameya Meclisa Jinan 2021: 8). Erkê wê hemû karê û barê darayî yê meclisê dide meşandin, çi raporê darayî be.

Pergala hevserokatiyê

Li cihekî û di civakekê de têkilî di navbera kesan de li ser rêgezên jiyana wekhev û azadiya jinan hebin, civakek demokratîk wê ava bibe. Dema ku navenda têkoşîna azadî û wekheviyê ne jin be, ew têkoşîn nagihêje rastiyê û azadî û wekhevî pêk nayên. Di encamê de aştiya civakî bi rêya jiyaneke azad a bi rêkûpêk û bi ewle pêk tê. Jin pêşengiya polîtîkaya demokratîk dikin û jin li her warê rêxistinî pêşeng in di warê civakî de bi awayekî wekhev dixebitin. Dema ku di nava civakê de kota jin û mêr wekhev be, wê demê hevsengiyek ava dibe, ev hevsengî bi modela hevserokatiyê bi pêş dikeve ya ku rengekî demokratîk dide pêş û civakê bi pêş dixe.

Ya girîng ku lazim e were gotin li dawiya vê beşî de ewe ku li Rojava¨Bakur û Rojhelat a Surî de; gel û saziyen rêveberî ya xweser a demokratik kem kem ber bi lihevhatin û hevdû famkirin ve diçin. Çanda xwerêveberî û nenavendîbûnê di nava gel de hêdî hêdî cih digire û berê civakê dide wekheviyê.

Li cihê ku tenê dengê yek alîyî yê civakê û desthilatdarî hebe li wir azadî pêk nayê, bersivên rast nayên peydakirin, ji boyî vê berpirsiyarî û nûnertiya hevbeş û demokratîk ya jin û mêr tovê polîtîkaya li her warê jiyanê pêwîstiyek e, di warê polîtîkayê de avakirina hevjiyana azad bi pergala hevserokatiyê pêkan e.

Pergala hevserokatî li ser bingehê nûnertî û wekheviya her du zayendan pêk tê, ne dabeşkirina deshilatdariyê heye û ne jî zêdekirina kursiyan e. Modelên rêveberiyên hevbeş û pergala hevserokatiyê îrade û mejiyê hevbeş ê civakê ye.

Di dîrokê de ji bo mafê jinan ji bo dengdayînê bi dehê salan tekoşîna jinan dewam kir, lê mafê wan nehatin misogerkirin, gelek rê û rêbaz hatin meşandin û ceribandin ji bo cihgirtina jinan di siyasetê de, lê ji bo misogerkirina mafê wê di sîyasetê de gelek tekoşîn hate kirin û pergala hevserokatiyê wek encama wan tekoşînan derdikeve pêş.

Pêkanîna pergala hevserokatiyê tê wateya parvekirina peywiran û ev pergal saziyeke giring e ku rê li ber nêzîkatiyên desthilatdariyê û serdestiya zihniyeta mêr digire ku xebat û keda jinan li gorî berjewendiyên xwe îstîsmar kiriye û wan paşmayî di warên civakî, siyaset û saziyên biryardayînê de hiştiye. Dema ku di her warê xebatê de pergala hevserokatiyê û nûnertiya adil pêk were, ev tê wê wateyê ku civak wê bi îradeyeke hevpar bi rê bikeve, her wiha wê bibe warê sereke yê têkoşîna jinên ku xwe bi zanebûn û rêxistina demokratîk xurt dikin û ew ê mirovan bîne ser rêya rast û bi vî rengî wê li dijî îradeya desthilatdar a zilam bi ser bikeve û vîna mirovê azad bi pêş bikeve (KJK 2016).

Dema em vedigerin dîroka vê pergalê, jixwe yekemîn partiya siyasî ya cîhanê ku ezmûna hevserokatiyê pêk anî, Partiya Kesk a Elmanyayê bû. Piştî ku Partiya Kesk ev sîstem xist pratîkê de vê modelê îlham da partiyên ku ji bo wekheviya zayendî têdikoşin (Ozdemir 2021). Bi rêz Abdullah Ocalan ji bo bidestxistina mafê gelê kurd berxwedaneke dîrokî meşand, wî pergala hevserokatiyê xist rojeva xwe û xwest ku ev paradigma di nava rêxistinên kurd de bê sepandin. Di wê demê de Partiya Civaka Demokratîk (DTP) linTirkiye û Bakûrê Kurdistanê Ahmet Turk û Aysel Tuğluk kirin hevserok û ezmûna hevserokatiyê jî di nav refên Tevgera Azadiya Kurdistanê de derket holê. Ev nîqaş di navbera salên 2000 û 2005'an de hat meşandin. Tevî ku ev ezmûn pêşî li Ewrûpayê li cem hin partiyan derket, lê em vegerin dîrokê, em dibînin ku ramana rêveberiya hevbeş di navbera jin û mêran de dubare bûye. Dema mirov li mînakên Xwedawenda Dayikê dinihêre, xuya dibe ku di serdema Xwedawendên

Newekheviya zayendî yek ji encamên îdeolojiya desthilatdariyê ye ku tê de zilamperestî bi hêz e û serweriyê bi pêş dixe, û jinê bi jintiyeke reben û pepûk bi cih dike. Di civaka baviksalarî de di her warî de nasnameya jinê windayî ye di warê leşkerî, siyasî, aborî û civakî de.

Terz û rêvebirina desthilata nû ji hikûmeta Beesê ne cuda ye, ji ber ku armanca hêza desthilatdar tinekirina rol û îradeya jinan di rêveberî û civakê de ye. Ji ber wê pêwîst e ku jin pergala neteweya demokratîk biparêze, ew garantiyeke azadiya jinan e, tê de demokrasî heye, û li ku derê demokrasî hebe, azadiya jinan wê hebe.

Dayikê de di salên navbera 4000 û 2000 berî zayînê de duoyek ku ji mêr û jinekê pêk tê hebûye.

Ev pergal li Bakûrê Kurdistanê hat ceribandin di şaredariya de, piştre hêdî hêdî li saziyên civakî, siyasî û rêxistinbûyinê hat pêkanîn û em dibînin ku ji wê demê ve êdî tevgera azadiyê ev pergal kir wek mercekî di her saziyê de, ku îro li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ta sala 2025'an dibe tiştekî naskirî weke qanûneke naskirî di her saziya siyasî, civakî û her warê rêxistinê de. Gava Partiya Kesk a Elman ev pergal pêk anî tenê di partiyên siyasî de bi kar anî û di nav civakê û rêxistinê de belav nabe û wekî tecrûbeyeke sîyasî bi pêş nakeve. Her weha li Emerîkaya Latînî jî tecrubeyêke weha hebû ew jî bi pêş neket. Lê li Kurdistanê, li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê di nav civakê de belav dibe, dibe modelek û dibe weke pîvaneke bingehîn.

Pergal li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê li hin cihan şeklî maye, jixwe ev pergaleke felsefî ye, ku ew yek ji formên hevjiyana azad e û felsefeya hevjiyana azad berfireh e. Ji ber wê ewqas tekoşîn û fêmkirin ji bo pêkanîna wê pêwîst e. Ev pergal dibe gavek ji bo pêkanîna hevjiyana azad hem jî dibe encama wê felsefê. Ji bo fêmkirina vê pergalê, pêwîst e em desthilatdarî û çavkaniyên desthilatdariyê yên li gora zehniyeta dewletê, tehlîl bikin. Ji bo wê diviyabû ev pergal di Peyamana Civakî de wek mafekî bê misogerkirin, weke bipêşketin û tekoşîna ji bo sepandina vê pergalê li ser bingehê hevjiyana azad û bi zihniyeta hevbeş û hevpar dûrî deshilatdariyê û lipeyxwehiştina fêmkirinên şaş ên tevgerên jinan û fêmkirineke rast ji zêhniyeta jin û mêran re.

Di Peymana Civakî de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, xala bîst û şeşan dibêje, mafê jinan heye ku di her warê jiyanê yê siyasî, civakî, çandî, aborî, îdarî û yên din de bi awayekî wekhev beşdar bibin û biryarên têkildarî karûbarên xwe bidin (Destûra Peymana Civakî 2016).

Pergala hevserokatiyê ji bo jinan firsendeke dîrokî ye û bi îsbatkirina vê rolê wê bibe modela îdeal a lipeyxwehiştina zîhniyeta desthilatdar. Her weha dibe ku pergala alternatîf be li dijî pergala baviksalarî ya otorîter ku desthilatdariya xwe li ser her kesî ferz dike. Ji bo bidestxistina hevsengiya civakî, dibe ku ev çareseriya herî baş be.

Piştî ketina rêjîma Bees û serwerbûna rêveberiya HTŞ`ê li ser Sûriyê, gelek jinên Sûrî di xeyal û bendewariyekê de ne. Ev fikar ji tirsa derbarê beşdariya siyasî, azadiya vegotinê, wekheviyê, nemaze di bin nakokiyên berbiçav ên di navbera daxuyaniyên fermî û tevgerên rastîn de tên kirin. Pir çalakvanên jin hişyar dikin ku cihê jinan di karûbarên cuda de wê were astengkirin û desthilata nû biryar û kiryarên li dijî mafên jinan wê pêk bîne, ji ber ku HTŞ hêzeke îslamî ya hişk tê dîtin. Ev yek di demekê de ye ku pir daxuyanîyên navnetewî û şandên ku serdana Şamê kirine, behsa giringîya rola jinê di siberoja Sûriyê de dikin.

Li hember gotûbêjên ku li ser cihê jinan bi hatina HTŞê re, rola jinan ya li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê an ku li cem Xweserîya Demokratîk berçav e û weke ezmûneke ku rola jinan tê de li pêş e tê dîtin. Jin li vê derê xwedî rolên sîyasî, leşkerî û civakî ne. Lewma doza derdikeve pêş ew e ka destketiyên jinên Kurd çawa wê werin parastin û ji bo jinên Sûrî jî bibe piştgirî ku maf û azadîyên jinan di destûrê de bên misogerkirin, herwiha jin di jinûveavakirinê de jî xwedî rol bin. Li gora ku tê dîtin, terz û rêvebirina desthilata nû ji hikûmeta Beesê ne cuda ye, di aliyê zêhniyetê de dişibin hev ji ber ku armanca her hêza desthilatdar di asta sereke de tinekirina rol û îradeya jinan di rêveberî û civakê de ye. Ji ber wê pêwîst e ku jin pergala neteweya demokratîk biparêze. Neteweya Demokratîk garantiyeke azadiya jinan e ya ku gel hev du qebûl dikin û ji hev bawer dikin. Tê de demokrasî heye, û jixwe li ku derê demokrasî hebe, azadiya jinan wê hebe.

Çavkanî:

Ghaderi, Farangis. 2006. "جنبش های اجتماعی زنان"[Tevgerên civakî yên jinan]. Wergêr: Kenanê Nado. Marivan: Zribar. Spring 60, 2006.

Rêziknameya Meclisa Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê. 2021.

AlSadawi, Nawal. 1990. Jin û zayend [المرأة والجنس]. Eliskenderiye: Dar almusteqbel.

de Beauvoir, Simone. 2008 [1949]. The second Sex I [الجنس الآخر-1]. Wergêr: Nada Hedad. Amman: Alahlia for Publication and Distribution.

de Beauvoir,Simone. 2015 [1949]. The second Sex II [الجنس الآخر-2]. Wergêr: Sahar Saad. Şam: Alrahba for publication and distribution.

Ocalan, Abdulah. 2018. Parêznameya Sêyemîn [Sosyolojiya Azadiyê]. Wergêr: Rêşad Sorgul. Qamishlo: Weşanên Şilêr.

Destûra Peymana Civakî di qadên rêveberiya xweseriya demokratîk de. 2016.

KJK. (2016). نظام الرئاسة المشتركة] Sîstema hevserokatiyê.

Ozdemir, Hacer. 2021. (Co-presidency) Feminist memory.

*** Mamosteyên Zanîngeha Rojava, Fakulteya Zanistên Civakî, Beşê Jineolojiyê.**



Medoka Melê pişta xwe bi ço qewîn dike?

Luqman GULDIVÊ*

Li Ripinê meseleyek tê gotin û tê de karakterekî sereke Hemedê Henê ye; Hemedê Henê xirîstiyan e. Karaktera din a sereke jî Medoka Melê ye û ew jî misilman e. Îcrayeke sala Tebaxa 2003'yan Mihemed Sedîq Tahirê Ripînî (MSTR) ew li kampa penaberan a Mexmûrê gotiye. Agahiyên li ser vê îcrayê ji Turgut 2010 hatine wergirtin.

Agahiyên li ser îcrayê kêm in û pirsa me jî ew e, çawa Medoka Melê dikare nav dixwe bide û bibêje, hûn min didinê, bidinê û hûn min nadinê, ez ê biçim ser dînê Hemedê Henê? Ji ber ku bêpişt gotina van peyvan, weke xwekuştinê ye, em ê hem ji naverokê hewl bidin fêm bikin û hem jî çavên xwe li çavkaniyên din ên muhtemel bigerînin.

Em pêşî berê xwe bidin agahiyên li ser vê îcrayê. Li gorî şairên deverê bûyer li Qilabanê qewimiye. Îcraya bûyer pê tê gotin, stran e. Stran - yan jî ew qismê stranê - weke diyalogeke di navbera Medoka Melê û dayika wê de hatiye sêwirandin. Medoka Melê dixwaze ku wê bidin Hemedê Henê:

Ax lê mi bidinê Hemedê Henê mi dixwazit oy lê lê ûy dayê
Wey mi bidinê pa bi Xwedê hegi mi nedinê ezê xwe bidim û lê lê hay dayê ax lê bi revandinê

Dayik razî ye (diyar e li ser navê bêv jî dipeyive: Em te bidinê) bi şertê misilmanbûna Hemedê Henê. Em fêm dikin ku Hemedê Henê xirîstiyan e, ji ber ku Medoka Melê dibêje, yan hûn ê min bidinê yan na ez ê biçim ser dînê wî.

> ■ Çawa Medoka Melê dikare nav dixwe bide û bibêje, hûn min didinê, bidinê û hûn min nadinê, ez ê biçim ser dînê Hemedê Henê? Ji ber ku bêpişt gotina van peyvan, weke xwekuştinê ye.

Wey banê pûş e qutk û êlegê Ḧemedê Ḧenê qedîfe ye delîl dayê lê lê dayê lê
Û tev qumaş e pa bi Xwedê hingî mi nedinê ezê biçim ser dînê feleha lê lê hê dayê lê wey lê delîl dayê ser dînê keşe

Bi vî halê xwe di îcrayê de em nabînin, ka Medoka Melê, bi çi pişta xwe qewîn dike û van gotinan dike. Yanî heger Hemedê Henê baweriya xwe bi xurtiya xwe bîne û Medoka Melê jî xwe bisipêriyê, em ê jê fêm bikin.

Çimkî bi van gotinan Medoka Melê ne tenê canê xwe, lê canê Hemedê Henê jî diavêje ber şûr û heger pişteke ji derba şûr qewîntir nebe, ev kuştina her duyan e.

Mesele ne ya devera Qilaban e

Lê li cihê vê îcrayê, ti kes bi serhatiya meseleyê xweşik nizane. Ji ber wê, ji devera vê îcrayê agahî nikarin bi dest bikevin. Jixwe yeqîniya ku dibêje, bûyerên stranê li Qilabanê qewimîne em nikarin piştrast bikin, lê bi ser de jî ti agahî û peywendiya maqûl berdest nabe, em nikarin meseleyê safî bikin. Gava agahî nebûn, pirsên din jî bê bersiv man: Gelo stran piştî kuştina Hemedê Henê û Medoka Melê hatibû gotin? Yan gelo ev tenê çîrokeke dramatîk bû ku hatiye giştîkirin? Yan gelo dayika Medoka Melê piştî reva her duyan gotiye?

Avahiya hunerî ya çîrokê dibe ku agahiyan bide me. Melodiyeke xemgîn a stranê heye. Terzê îcraya MSTR jî vê xembariyê bêhtir derdixe pêş: Gelek rist bi bangekê yan jî heydêniyekê bi dawî dibin ku dişibin girî. Di rewşên asayî de ev bang û heydênî li destpêk yan jî dawiya bend û ferdayan tên bikaranîn. Lê di vê stranê de ji 7 ristên ferdaya ewilî 5 (ji bilî rista 4'an û ya 7'an) bi heydêniyê bi dawî dibin.

Bi ya me di vê yekê de naveroka îcrayê xwedî rol e: Du jin li hev vedigerînin, her du jin gelekî nêzî hev

in: Dê û keç. Ji bilî vê Meseleya dilketinê (Evîna Medoka Melê) jixwe meseleyeke xembar e û peydanekirina çareyeke maqûl jî vê xembariyê zêde dike. Ev naveroka hanê îhtîmal e tesîr kiribe li wê yekê ku îcraker wan dengêniyên nêzî girî, ji bo dawiya her ristê bike adet.

Lê belê dibe ku îcrakera ewilî jî dayik bi xwe be û peywendiya wê ya bi meseleyê re dibe ku kiribe ev xembariya di îcrayê de hîna ji destpêkê ve jî hatibe hûnandin. Ji ber wê em dikarin îdîa bikin ku tesîra cinsiyeta civakî ya îcrakerî/ê destpêkê (anonîm jî be) tesîr li avahiya ristan û ferdayan kiriye.

Canoyê rêzan beriya 156 salan

Ne ji îcrayê, ne ji agahiyên îcrakeran û ne jî avahiya hunerî ya îcrayê bersiva pirsa me neda. Lê rêyeke din piştre bi ber vê lêkolînê ket: Çîrokeke ku Eugen Prym beriya bi 156 salan li Torê ji rêzan û wergerê xwe yê Suryanî Cano bi Kurmancî berhevkirî. Ev kitêb hîna nû sala 1887'an hat weşandin.

Cano, ev serhatî û stran sala 1869'an bi du awayan ji Prym re gotine (1887: 64-66 û 1887: 67-70). Paşê Socin jî versiyoneke heman serhatiyê bi stranî li Nisêbînê li dêra Mar Yaqûbê jî kom kiriye (1890: 267-269), lê belê di vê versiyonê de navê Mihemedê Hena weke Mihemedê Xano hatiye nivîsîn. Di van veriyantan de Medoka Melê keça şêx e. Lê em ji navê wê jî tê derdixin ku ew keça melê ye. Diyar e ku stranbêjên suryanî xwestine rewşa dramatîk bi mubalexeyeke bi vî rengî bêhtir dramatîk bikin. Ev destan mînakeke baş a wan destanan e ku li ser evîna du kesên ji du dînên cihê ne.

Ji van hersê variyantên di sedsala 19'an de berhevkirî, em resmekî berfereh ê çîrok û stranê nas dikin. Hena li ber destê Metranê Dêra Zeferanê (Li Mêrdînê) dixebite û ew diçe hasila gundan. Metranê ku navê wî nayê hildan, wî rojekê dişîne hasila Ewênayê. Ewêna îro bajarokek e ku navenda eşîra Surguciyan e. Hena tevî xulamekî diçe Ewênayê û li mala melê dimîne. Li wir Medokê dibîne: Heyva çardehşevî, spehî ...

Di pencereyeke nava malê de hev dibînin û henek û yariyan bi hev re dikin: Medoka Melê dil dikeve Hena. Li vir balkêş e ku îcraker gelek caran dibêje, Hena bîr nebir ku Medoka Melê dil bikeve wî û qebûl bike bibe xirîstiyan. Navê Hena jî gelek caran Hena ye û ilehî ne Mihemedê/Hemedê Hena ye.

Medok li ser Hena dimire

Evîna Medoka Melê wilo ye ku her bide dûv Hena. Hem xelk behs dike û hem jî bav pê dihise. Xebero, bav ji Hena re dibêje, tu ji me re nabî û keça me jî ji te re nabe. Hena jî dibêje, wî bîr nebiriye ku keça melê dil bikeviyê. Wî ji Medokê re jî gotiye, wan çend henek û yarî kirine û ew xirîstiyan e û misilman nabe.

Li gorî serhatiya pêşî ya Cano, Medoka Melê ji evîna xwe dest bi nihurandina li ser Hena kiriye:

Mihemedê Hena ji mal hat û min nas nekir,
Min pirs û gotina xwe jê nekir,
Rûyê min ramîsan nekir.
Mihemedê Hena suwar bû li dondilê,
Ji dêrê hat ser hasilê,
Heke li vir nebû, ez ê birevînim wî bibim Mûsilê.
(Prym 1887: 64)

Bersiva Hena 'na' ye, xirîstiyan û misilman bi hev re nikarin bizewicin. Medoka Melê eşkere dibêje, ew ji Hena pê ve ti mêran nake û amade ye bibe xirîstiyan. Ha piştî vê di variyanta pêşî ya Cano de agahiyeke diyarker heye ku dike em pê bihisin, tewazûna hêzê ya serdema bûyerê, ji ya niha guhertîtir e û pirr tevlîhevtir e jî:

Gund hemûyî bihîst, rabûn li Hena xin. Yek ji gund go, lê mexenê metran bibihîsê, wê gilhê me bikê, wê gund batimîj bê.
(Prym 1887: 64)

Hena berê xwe dide Dêra Zehferanê û Medoka Melê jî tevî ku Hena naxwaze, bi zora xwe pê re diçe. Gava Metran pêdihise, reaksiyona wî nîşan dide ku ew jî rewşa civakî û siyasî li ber çavan digire: Destûrê dide ku gundî her duyan bibin Ewênayê. Axir Hena li gund venahewe, vedigere û Medok jî bi zora xwe pê re vedigere. Di encamê de diçin Mêrdînê cem Paşê da ku meselê hal bike:

Şandin Mêrdînê, keçik bernadê. Ew û keçik hatin Mêrdînê, çar ji gundî vê re heye. Çûn cem paşa, miclîs civiya, feleh hatin miclîsê, wekîlê metran hat Xoce Cebbûr. Ew û paşa li hev dan bi xebera. Xoce Cebbûr go, emê felleh bikin keçikê.
(Prym 1887: 65)

■ **Mesele çareser nabe, Hena misilman nabe, lê keçik hazir e biçe ser dînê Hena. Paşa ji bo hela meselê, her duyan dişîne cem miftiyê Diyarbekirê. Li cem miftî jî Medok dibêje, ez dev ji Hena bernadim.**

Mesele hal nabe, Hena misilman nabe, lê keçik hazir e biçe ser dînê Hena. Paşa ji bo hela meselê, her duyan dişîne cem miftiyê Diyarbekirê, Xoce Mûsa. Li cem miftî jî Medoka Melê dibêje, ez dev jî Hena bernadim.

Îcraker Cano ewilî dibêje, sêhr lê kirin û Hena xepandin ew birin Ewênayê. Bi qasî ku ez ji liberhevgirtina her sê variyantên 1869'an têdigihîjim, Hena paşê li Diyarberkirê hazir e ji ber memûriya dewletê û malê dinyayê tema bibe; lê diyar e weke midûr çûna Ewêna jî tesîrê lê dike:

Mişûr Hena qaneh kir, go musulman biba, ezê te çêbikim midûr, te bişînim ser 'Ewênya. Go, bera bê.
(Prym 1887: 66)

Li gorî Cano, Hena xwe şaş kiriye. Bi qasî xuya dike, poşman bûye:

Li min û li wê defterê,
Ez ê vegerim cihê berê,
Ez hatim Diyarbekrê lê ne bi vê xeberê.
Malê me rêke,
Çawa dilê te dixwazê rabe çêke,
(Prym 1887: 66)

Li vir mesele ew e ku Hena li ber şahidan misilman bûbû. Di geriyana çareyê de Medoka Melê ji bo ku Hena dîsa xirîstiyan bibe pêşniyaz dike biçin cem balyoz (ê dêrê)! Piştî halkirina karûbaran, Hena diçe cem qensil (muhtemel e ku serokê meclîsa dêrê be û ne meclîs bi xwe be / ji bilî 7 meclîsên ekumenîk ên dêrên xirîstiyaniyê, meclisên bi navê council: qensil ên dêra ortodox a sûryanî jî hene).

Qensil bi doza Hena radibe, lê ew û Paşa li hev nakin: Li ber şahidan misilman bûye, ma veger jê dibe? Qensil gava mesele hal nabe, dibêje ew ê berê xwe bide Stenbolê cem siltên. Piştî ku hazirî diqedin, paşa ji îhtîmala cezayên ku siltan lê bibirre, dişîne dûv qensil û destûrê dide ku Hena bibe xirîstiyan, lê Medok misilman ma û paşa ew bire mala xwe da ku neçe cem Hena.

Pişta Medokê dêra ortodoks e

Em dibînin ku gelek faktorên û aktorên (hin faktor di heman demê de aktor in jî) cuda di meseleyê de bi rolekê radibin: Dêra Ortodoks a Suryaniyan û metran, balyoz û qensilên wan, paşayê Mêrdînê, miftiyê Diyarbekirê, paşayê Diyarbekirê, Siltanê Osmaniyan, melayê gund (yan jî şêx), rola diyanetê, rola du şerîetên cuda, rola civaka gund li Ewênayê, rola xelkê bajêr li Mêrdîn û Diyarbekirê.

Lê Medoka Melê yekşemê bi dizîka xwe digihîne mala qensil û Hena:

Mihemedê Hena li Diyarbekirê kes nabînê,
Li cem qensil e, ecêbekê digerînê,
Mihemedê Hena rabe berê xwe bide Mêrdînê.
Bejna te rihan e, jixwe gul e,
Mihbet û evîn erê ji dil e,
Emê biçin Mêrdînê bimînin li ser dînê file.
(Prym 1887: 66)

Li gorî serhatiya ku Cano dibêje, Hena bi vê qaîl dibe û ew vedigerin Mêrdînê û mesele jî çareser dibe.

Em dibînin ku ew agahiya di îcraya li Qilabanê de ya kêm bi awayekî heq bi me re wê pirsê çêdike: Pişta Medoka Melê çi ye ku dikare wisa nav di xwe bide di rewşeke ewçend xeternak de?

Îhtîmalên ewilî yên ji vê îcraya ji Qilabanê dikarîn berdest bibin, wisa xuya dike ku hemû jî ne cih de bûn: Ne Medo ne Hena nehatine kuştin; Dayika Medokê piştî reva keça xwe yan jî mirineke muhtemel a keça xwe, ev stran negotiye, ev jî îhtîmala ku xemgîniya melodiyê ji ber vegotina bi awirê dayikê be, kêm dike. Lê belê her wiha diyar dibe ku Medoka Melê pişta xwe dida hêzekê û ew hêz jî ya Metranê Dêra Zehferanê li Mêrdînê - Li Diyarbekirê ev dibe qensilê dêra ortodoks - bûye.

Meseleya civîna meclîsa bajêr a ku Paşa dixwaze bicive ji misilman û xiristiyanan, meseleyeke muhim e ku mirov ji hev derxe. Hem rola wê, hem hêza biryarên wê; ji bilî belgeyên nivîskî di bîra civakî de man û nemana van meclîsan û tesîrên wan jî dikarin mijarên muhim ên lêkolînan bin.

Îcraya li Qilabanê û îcrayên Cano bi hev re agahiyên pirr dewlemend didin ji bo ku em dînamîka peywendiyên hêzê yên diyanetên cuda di sedsala 19'an û muhtemelen sedsala 18'an de jî bi dest bixin. Lêkolînên siberojê dikarin bi xwendina van serhatiyan û liberhevgirtina arşîvên Osmanî û arşîvên dêran, wêneyekî tekûztir ê van dînamîkên hêzê xêz bikin.

Çavkanî

Prym, Eugen û Socin, Albert. 1887. Kurdische Sammlungen, erste Abteilung, Erzählungen und Lieder im Dialekte des Tur Abdin. Sankt Pêtêrsbûrg: Eggers et Comp.

Socin, Albert. 1890. Kurdische Sammlungen, zweite Abteilung, Erzählungen und Lieder im Dialekte von Bohtan. Sankt Pêtêrsbûrg: Eggers et Comp.

Turgut, Lokman. 2010. Mündliche Literatur der Kurden in den Regionen Botan und Hekarî. Berlîn: Logos Verlag.

* Dersdar li Zanîngeha Kobaniyê û Zanîngeha Rojava.

Porkurê

…

Dema ku têlên porên birîndar
Kul û keserên xwe
Ji tiliyên te re vedikir
şûrekî fermî
Ew kêlikên xwedayî diherimand
çilçaviyên keziyên min
Bi girî ve dikir
…

Gulîzer